



# TÊKOŞER

HEJMAR 35

ADAR 1987

<p>په پیاوړه سیمه نیک و بده چو آواز نرمت نیاید که بگوش همه راز دل برکت دی بر که خود پرورانی و خود بسپری خدا یاواز و برهان شرح برو سالمان انجمن شد هزار</p>	<p>که دست نه بر وساها مقصد همی پروراندت باناز و هوش پدوشاد باشی و شادی بدو جهانمایه بد مهر و بد کوهری</p>	<p>از ان برج بردن چه آمدش که گیتی نچو اهدکشت دنت راز نخواهد نمودن بید نیز چهر بدلت اندر از درد خون آورد</p>	<p>از پیش برخت شاهی نبود چو باید می زندگانی دراز یکایک چه گویی که گسترده یکی نغز بازی برون آورد</p>
<p>پادشاهی ضحاک هزار سال بود</p>			
<p>برآمد برین روز کار دراز پرکنش شد کام دیوانگان زینگی نبود می سخن جز بارز سربانان را چو آف سپر بند</p>	<p>شده بریدی دست دیوان دراز که چشمید راهر دو و نخریدند</p>	<p>نهان را پستی اشکارا کردند برون آوریدند لرزان چو پند</p>	<p>سراسر زمانه بدو گشت باز نهان گشت آیین فرزا حکان هنر خوار شد جادویی از جند دو پاکیزه از خانه چشمید</p>

TEKOŞER: KOVARA TEKÖŞER, YEKİTİYA KARKER Û XWENDEKARÊN KURD LI BELÇİKA

NAVNIŞAN: rue BONNEELS, 4 - 1030 BRUXELLES - BELGIQUE

TEL: 02/230.89.30

NAVNIŞANA POSTÊ: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 50 F.B.

N° BANKÊ: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMİTA NIVİSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

## N A V E R O K

CARDIN TIRKIYE ERIŞI KURDISTANA IRAQE KIR .....	Derwêş .....	R. 3
CIVINA ÇAPE LI PARLAMANA EWRUPA .....	Pervîn .....	R. 4
RİZIMANA KURDÎ (VIII), KETINA TİPAN Û HEVGIRTIN .....	C. BEDIR XAN û R. LESCOT.	R. 6
HELBEST: HEVÎ .....	Amed .....	R. 9
BELGELERDE NEWROZ .....	Nêrgiza TORÎ .....	R.10
TIRKIYE XWAZGİNA C.E.E. YE? .....	Nuriddîn ZAZA .....	R.12
DİROKA KURDISTANÊ DI ANSİKLOPEDIYA ISLAMÊ DE (VIII) .....		R.14
KÛRTLERDE SANAT (III), URARTULAR .....	Nêrgiza TORÎ .....	R.19
ZIMANE KURDÎ (IV), ZARAVÊ GÖRANÎ .....	Fuad HAMA XORŞİD .....	R.22
XEBATA ME .....		R.26

## S O M M A I R E

LA TURQUIE A DE NOUVEAU AGRESSE LE KURDISTAN D'IRAQ .....	Derwêş .....	P. 3
CONFERENCE DE PRESSE AU PARLEMENT EUROPEEN .....	Pervîn .....	P. 4
GRAMMAIRE KURDE (VIII), CHUTE DE PHONEMES ET CONTRACTION ..	C. B. XAN et R. L..	P. 6
POEME: HEVÎ (ESPOIR) .....	Amed .....	P. 9
NEWROZ (NOUVEL AN KURDE) DANS LES DOCUMENTS .....	Nêrgiza TORÎ .....	P.10
LA TURQUIE CANDIDATE A LA C.E.E.? .....	Nouredin ZAZA .....	P.12
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (VIII) .....		P.14
L'ART CHEZ LES KURDES (III), LES URARTU .....	Nêrgiza TORÎ .....	P.19
LANGUE KURDE (IV), DIALECTE GÖRANÎ .....	Fuad HAMA XORŞİD .....	P.22
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES .....		P.26

## I N H O U D

TURKIJE HEEFT WEER IRAAKS KOERDISTAN AANGEVALLEN .....	Derwêş .....	P. 3
PERSKONFERENTIE IN EUROPEES PARLEMENT .....	Pervîn .....	P. 4
KOERDISCHE GRAMMATIKA (VIII), WEGVALLEN VAN KLANKEN EN SAMENTREKKING..	C.B.X...	P. 6
POEZIE: HEVÎ (HOOP) .....	Amed .....	P. 9
NEWROZ IN DOKUMENTEN .....	Nêrgiza TORÎ .....	P.10
TURKIJE KANDIDAAT-LID E.E.G.? .....	Nuriddîn ZAZA .....	P.12
GESCHIEDENIS VAN KOERDISTAN IN DE ISLAMITISCHE ENCYCLOPEDIE (VIII) .....		P.14
KUNST BIJ KOERDEN (III), DE URARTU'S .....	Nêrgiza TORÎ .....	P.19
KOERDISCHE TAAL (IV), DIALEKT GÖRANÎ .....	Fuad HAMA XORŞİD .....	P.22
ONZE AKTIVITEITEN .....		P.26

# CARDÎN TÛRKIYE ÊRÎŞÎ KURDISTANÂ ÎRAQÊ KÏR

Derwêş

Hîmê dewleta Tirk li ser zorê ava bûye. Paş nijadkujiyên (qetliam) Ermeniyan ku di salên 1850 de dest pê kir û di salên 1914-1916 de kuştina milyonan li ber çavên cihanê berdewam kir, dewleta Tirk bi awakî dijwar berê çekên xwe da gelê Kurd ku wî jî bi riya zorê ji dîrokê rake. Zimanê Kurdî qedexa kir, çand û dîroka Kurdan inkar kir, leşkerê xwe şand ser gel û ew bi awakî vekirî pelixand. Serhildanên Kurdan li hemberê zora dewletê bi xwînî hatin perçiqandin. Dema ku dewleta Tirk, ku hîmê wê ji Kemalîzmê (zor û kuştinê) pêk tê, li hemberê hêzên Kurd ên azadîxwaz bêçare dima êrîş dibir ser gelê bê çek. Gundên Kurdan şewitandin, seranser agir berda çiyayên Kurdistanê û biçûk-mezin xistin zîndanên. Niha jî eynî zilmê dike.

Serhildana Şêx Seîd, Agirî, Dêrsîm û hwd. nîşe ne. Dewleta Tirkîyê ne bitenê wan diperçiqîne, lê gelê Kurd parçe dike, êlan (eşîr) berdide hevdu û li quncikekê li şerê nav wan dinêre.

Lê têkoşîna gelê Kurd bo azadiyê ne rawesta. Dewleta Tirk di 1960 û 1970 de dûsa bi hezaran zaneyên Kurd avêtin zîndanên. Gel ji zilma leşkerê Tirk dinalî. "Demokrasi"ya Kemalîst li Tirkîyê bi vî awayî xwe gihand 12 îlona 1980. Rojêke trajîk di dîroka Kurdistanê de.

Gelê Tirk li rejîma leşkerî û zilma wê li Kurdistanê ji dûr dinêrî. Bi hezaran bîrewerên Kurd ketin bin îşkencan, hatin kuştin, şewitandin û seqet kirin. Evqas zilm û zor dûsa li ber çavên cihanê çêbû û dinya dûsa bêdeng ma. Kurdistan bi gundên xwe, bi çiyayên xwe, seranser kete bin zilma leşkerê dewleta Tirk û ew zilm ewê hê jî dewam bike, ne bitenê li Kurdistanê Bakur, lê li Kurdistanê Başûr û ya Rojhilat jî ku li derê sînorê Mîsakî Millî ne.

Di 4 Adar 1987 de, leşkerê Tirk bi beşdariya balafirên şer êrîş bire ser Kurdistanê Başûr û gundên Kurdan bombardiman kirin. Dewleta Tirk berî niha jî êrîşên weha biri bûn ser gelê Kurd, hovîtiya xwe pêşan da bû.

## Sedemên harbûnê

Li Kurdistanê Başûr şerê gelê Kurd bi salan dewam dike û ber bi serfiraziyê diçe. Ji 1979 û vir de Kurdistanê Rojhilat jî şerê azadiyê bi awakî xurt dike. Van salên dawîn şerê di nav Îrana Xumeynî û Iraqê Saddam Huseyin bi hemû hêza xwe dewam dike û Xumeynî roj bi roj xurttir dibe. Bexdad jî ji hêza xwe hunda dike. Di eynî demê de, ji 1980 û vir de li Kurdistanê Bakur şerê çekdarî serê dewleta Tirk diêşîne.

Belê, ev sedemên jorîn in ku dewleta Tirk har dikin. Ew ditirse ku Kurdên Başûr û Rojhilata Kurdistanê ji şerê nav Îran û Iraqê istifade bikin û bigihin amanca xwe. Hînga têkoşîna Kurdistanê Bakur jî dikeve rewşeke din û li Tirkîyê çarçeve teng dibe.

Ji ber vê yekê ye ku dewleta Tirk "terorîzm", "çend lib eşqiyên qatil", "tehlîka Rojhilatê" dike behane û zilma xwe zêdetir dike, milîsan, caşên Kurd bi çek dike û wan dijî Kurdên azadîxwaz dike.

Sedemeke din jî ev e ku dewleta Tirk dibêje: "Navçên Mûsil û Kerkûkê yên Tirkan in. Divê em wan navçan û gelê Tirk li wira azad bikin, têxin nav sînorên Mîsakî Millî".

Dewleta Tirk hem gundên Kurdan bombardiman dike ku "welêt ji terorîstan paqij" bike û hem gundên Kurd ji Kurdistanê bi darê zorê dirake dibe Rojavayê Tirkîyê. 356 gundên derdorê Dêrsîmê bi zora dewletê mecbûr in axa xwe berdin û herin. Ji derdorê Bursa jî nêzî 450 gundên Tirk ji aliyê dewletê tên wira û li cihê Kurdan bi cih dibin. Bi vî awayî zilma xwe û "paqijkirina" xwe xurttir dike.

## Rola Amerîka

Amerîka dixwaze ji şerê navbera Îran û Iraqê istifade bike, bi temamî bixe bin kontrola xwe. Bo vê yekê ye ku Tirkîyê ji xwe re wek qereqol bi kar tîne. Hêzên NATO li Tirkîyê, nemaze li Kurdistanê, nêzî sînorê Îran-Iraq-Sûriye, tedbîran dikin û di nobetê de ne. Dewleta Tirk bi awakî vekirî bi arîkarî û planên Amerîka dixwaze midahela şerê navbera Îran û Iraqê bike, berî ku Îran rejîma Seddam Huseyin bişkîne, navçên petrolê, Mûsil û Kerkûkê îşgal bike, zoreke mezin li Kurdan bike û wan bi zilmeke dijwar bêdeng bike.

Li hemberê nijadkujî û planên îşgala Musil û Kerkûkê divê hemû hêzên Kurd û her weha hêzên demokratên Rojhilat û cihanê bi hemû imkanên xwe dij derkevin. Çewtîyên biçûk dikarin bibin sedemên nijadkujiyên mezin li Kurdistanê.

# CIVINA ÇAPÊ LI PARLAMANA EWURUPA

Pervîn

Di 25.2.1987 de, di çarçewa "Şebeka Agahdarî û Fêrkirinê li ser Mafên Mirov û Gelan" ku tê de 44 rêxistinên belçikî û biyanî hene de, Têkoşer (Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Belçîka) li Parlamana Ewropa, li Bruxelles, li ser pirsê kurdî peyivî.

Bernameva civîna çapê ev bû:

- Hector Vera, berpirsiyarekî Zanîngeha Aîtiyê ku serokê wê Pr. François Rigaux, Serokê Lîga Navnetewî ya Mafên Gelan, e, amanc û xebata Şebekê dan nasandin.
- Jacques Kahn, profesorek li zanîngeha U.C.L., li ser rola agahdarî û fêrkirina Mafên Mirov û Gelan peyivî.
- Raymonde Dury, parlementera belçikî ya sosyalîst û endama Parlamana Ewropa li ser agahdariyê û rola rojname û organên weşanê li Ewropa peyivî.
- Endamek ji Têkoşer li ser pirsê Kurd û Kurdistanê rawestiya. Ew, bi kurtî, li ser van nuqtan peyivî:
  - a) Rewşa gelê kurd weka nîşeke gelek giran û extrêm a pelixandina gelan tê hesabandin, ji bo ku tu mafekî wî tu neye û ku bi her awayî tê êşandin û pelixandin.
  - b) Faşîsttirîna çar hikûmetên ku Kurdan dipelixînin ya Tirkiyê ye, ji bo ku ji dema Atatürk heta nuha Kurd bi awakî fermî (resmî) Tirk tînin hesabandin, ango ew weka li Afrîka Başûr di bin nijadparêziya dewletê de ne. Tu partî, heta ya Ecevit û sosyal-demokratên jî, rakirina vê bendê ji zagona (qanûn) tirkî ne xwestiye.
  - c) Leşkerê tirk, bi alîkariya hêzên Nato, Kurdan ne bitenê li Kurdistanê Tirkiyê

lê li ya Iraqê jî, bi alîkariya hikûmeta Iraqê, dîkujê. Li gel vê qasê, ew bûye endama rêxistinên ewrupî, weka Nato, Konseya Ewropa, O.C.D.E., û nuha jî hertiştî dike ku têkeve C.E.E. (Bazara Ewropî).

- d) Bextreşîya Kurdan ev e ku welatê wan dewlemend e û cihê wan gelek stratêjîk e. Loma Kurd bûne qurbanê menfeetên gêo-polîtîk û stratêjîk. Rojname û organên weşanê yên ewropî, ji bo vê yekê, naxwazin ku gelek li ser wan bipeyivin.
- e) Kartêkirina (tesîr) rêzana Tirkiyê li Ewropa jî tê dîtin. Ji derveyî Swêdê, hikûmetên ewropî Kurdan weka Tirk dihesibînin. Rast e ku li Belçîka em weka rêxistineke kurdî tînin dîtin û ji aliyê Wezaretê Çandê tînin alîkarî kirin. Lê sê daxwaziyên me yên din nayên pejirandin (qebûl kirin):
  - Bernameke muntazam a kurdî di televîzyon û radyo de.
  - Fêrkirina zimanê kurdî - ne yê tirkî - di dibistanan de, ji bo zarokên kurd.
  - Hin şaredarî (belediye) navên kurdî ji bo zarokên ku nuh çêdibin napejirînin, ji bo ku sefaretxana Tirkiyê lîsteke navên tirkî dişîne.

Piştî vê axaftinê û dayîna bersiva pirsên rojnamevanan, Parlamenter, Mme Dury, got ku Parlamenterên Ewropî divên hikûmeta Tirkiyê mehkûm bikin û piştgiriya rêxistinên kurdan bikin.

Ji derveyî axaftinê, me dosyekê ji rojnamevanan re pêşkeş kir û pirtûk û broşûrên kurdî di nav salonê de raxistin.

## COMMUNIQUE DE PRESSE

### LES KURDES, LA TURQUIE ET LA CEE

Le gouvernement turc essaye depuis plusieurs années de faire croire à l'opinion occidentale que la Turquie est devenu un pays démocratique et que les droits de l'homme et les libertés fondamentales y sont respectés. Après avoir adhéré à plusieurs institutions très importantes: OTAN, Conseil de l'Europe, O.C.D.E.... elle essaye d'entrer à la CEE. Ceci prouve que ce gouvernement a réussi en grande partie à convaincre les Occidentaux que la Turquie est sur la voie de la démocratisation.

Hélas! la réalité est tout autre. Selon nous, malgré une certaine libéralisation de façade, les droits fondamentaux ne sont nullement respectés, surtout ceux du peuple kurde. Les dix millions de Kurdes de Turquie sont de plus en plus réprimés. Non seulement les militants et les sympathisants de la cause kurde sont torturés ou tués, mais l'ensemble de la population kurde est terrorisée, l'état de siège sévit toujours au Kurdistan et les deux tiers de l'armée turque, soit près de 300.000 hommes y sont installés, les tortures collectives sur les places publiques sont pratiquées couramment.

## CRITIQUE DES MEDIAS

Les mass-médias, européens en général et belges en particulier, ont l'habitude de se précipiter sur certains événements "chauds" et spectaculaires et y reviennent parfois très régulièrement. Par contre, ils négligent totalement d'autres faits, non moins importants et tragiques, comme par exemple le drame des Kurdes dans les quatre parties du Kurdistan.

Lorsque nous en discutons avec les journalistes, plusieurs nous répondent qu'il faut voir ce que le public demande. Or, nous constatons que souvent on bombarde le public d'informations qu'il n'a pas demandées et qui ne l'intéressent plus, à force de les subir.

Le fait de répéter une nouvelle, aussi importante soit-elle, sans en analyser d'une façon approfondie les causes et les effets, la banalise, et rien n'est plus dangereux que l'accoutumance. Tout se passe comme s'il s'agissait d'un film d'horreur ennuyeux! Le public ne comprend plus ces situations chaotiques et absurdes et cela le pousse dangereusement au mépris et à la peur des gens du tiers-monde et des immigrés.

Par contre, le silence total ou partiel sur les autres situations contribue à la désinformation du public et à son ignorance de ce qui se passe dans le monde.

Le rôle de l'information est primordial lorsque son but devient éducatif. Car l'information c'est aussi la contribution à la formation de l'esprit critique, l'ouverture envers les autres, et enfin au progrès social.

RENCONTRE  
AVEC LES  
JOURNALISTES AU



PARLEMENT EUROPÉEN

MERCREDI 25 FÉVRIER 1987

RÉSEAU D'ÉDUCATION ET D'INFORMATION

## DROITS DE L'HOMME DROITS DES PEUPLES

SECRETARIAT DU RESEAU  
DROITS DE L'HOMME --- DROITS DES PEUPLES

Bd du Nord 4, 5000 Namur  
Tél. (081) 22 81 02

## DROITS DE L'HOMME DROITS DES PEUPLES



C A T A L O G U E

VIDEOS DIAPOSITIVES DISQUES

BANDES DESSINÉES LIVRES ET DOSSIERS

### KURDISTAN

Kurdish music

PHILIPS 6586019

La communauté kurde, aujourd'hui  
sans territoire national, continue à  
affirmer son identité.

PL 0186

### Chaliand G.

Les Kurdes et le Kurdistan

Ed. Maspéro, Paris, 1981.

### TEKOSER (Union des travailleurs et étudiants kurdes en Belgique)

Rue Bonneels, 4, 1030 Bruxelles. Tél. (02) 218.68.09

#### OBJECTIFS:

- Aider les Kurdes vivant en Belgique à mieux s'insérer dans la société belge.
- Informer les Belges et les étrangers sur les Kurdes.

#### SERVICES:

- Animations, centre de documentation (brochures, dossiers, livres), cours de langue, soirées d'informations. Dias et vidéos (cf *supra*, Chap. I, programme G 10).

G10

### DENGË KURDISTANE

La voix du Kurdistan

TEKOSER, 62 min., 1984, Noir et blanc

Sur fonds de combats et d'espoirs, l'histoire moderne de la lutte du peuple Kurde face aux pouvoirs de l'Etat turc principalement, mais également irakien et iranien. Eclairage particulier de la logique géopolitique des grandes puissances permettant, au sein même de leur sphère d'influence, le développement d'un génocide d'une insoutenable permanence.

#### Orientations juridiques

— Déclaration universelle des droits des peuples, Préambule, art. 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7.

GENOCIDE/KURDISTAN/LUTTE DE LIBERATION

SK 2001

# R Ê Z Î M A N A K U R D Î


( Z a r a v ê K u r m a n c î )

- VIII -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (\*)

## KETINA TÎPAN Û HEVGIRTIN (\*\*)

67. Jîrbûna mezin a kurdî di lêgerîna hergavî ya kurtkirinê de xuya dibe. Ev xwestin ewê di lêhûrnêrîna hevoksaziya (damezrana hevokan, cumlan) vî zimanî de bi awakî taybetî (xusûsî) bê nîşan dan; lê baş e ku ji nuha de em wê di babeta zagonên (qanûn) dengî, ku ewê di bendên jêrîn de bîn lêhûrnêrîn, de dariçav bikin. Her gotineke kurdî, bi pêşveçûna xwe ya xwederî (tebîî), bi awayê xurttirîn xwe hev digire, hêdî hêdî, çiqas mumkin be, xwe ji bêtirî-nên dangan sivik dike, heta ku bibe yekîte (kîte: Li hejmar 34 binêre). Ev awayê pileyî (tedrîcî) carna bi rakirina hin regezan (unsur), û carna bi hevgerîtinê, pêk dibe. Emê van diyarbûneyên (hadîsên tebîî) cihê bi awakî veqetayî waf bikin.



Rizyang

68. **Ketina dengdêran** Me ji berê ketina "i" û "e", bi pêketina (kontakt) dengdêrên dirêj (li bend 8 û 9 binêre) nîşan da bû. Havay nuha hin nîşeyên din li ser rakirina dengdêrên kurt û dirêj:

Rizyang	dêlva	rizyanik
Dargerîng	dêlva	dargerînek
Argûşk	dêlva	alîgûşk
Parxan	dêlva	parîxan (parsuya ku di-live)

**Ketina dengdaran** Ji bo nîşeyên ku li ser t, j, k, h, l, n, ji berê hatin gotin, meriv vedigere bend 44, 47, 52, 58, 59 û 40.

Rakirinên weha piraniya caran dixwazin ku tofine (kom) çend dengdaran sivik bikin:

### a) Di hundirê gotinan de

<b>Nîşe:</b> Desgeh	dêlva	destgeh (malzeme, alet)
Domam	dêlva	dotmam
Desmal	dêlva	destmal
Cênîk	dêlva	cêndîk (kêleka rû)
Biçeng	dêlva	binçeng
Cihar	dêlva	cehwar (tûrik)

### b) Di dawiya gotinan de

Bi awakî giştî, dengdara duyemîn a her du dengdêrên dawîn e ku hunda dibe.

<b>Nîşe:</b> Yekşem	dêlva	yekşemb
Por	dêlva	port
Ben	dêlva	bend
Berçav	dêlva	berçavîk
Erzîn	dêlva	erzînik (çene)
Gir	dêlva	girs

Lê meriv hin nîşeyan li ser ketina yeke-mîna du dengdêrên dawîn dibîne:

(\*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

(\*\*) Hevgirtin: Kurtkirina gotinekê bi xistina hin tîpên wê. Nîşe: Rohnî = ronî. Rojava = roava.

Zengelok	dêlva	zengelork (hestiyê girs ê qirika zilaman)
Pêpik	dêlva	pêping (ji pêpeling: derece) (bi soranî: pile)

70. **Ketina tofên tîpan** Di gelek rewşan de, nema dengdêr yan dengdarên tenha, lê çend tîp bi hev re hunda dibin. Guhertinên weha bi awakî giştî di gotinên ku ji sê kîteyan yan bêtir ava bûne de dibin û wan dikin du yan sêkîteyî.

**Nîşe:** Dawîneka raderî (rader: mesder) "-an" di cihê "-ayîn", "-ihan" de xuya dibe:

Nêrîn	ji	nihêrîn
Gurçik	ji	gurçîlik
Ar	ji	agir
Tevnepirk	ji	tevna pîrikê
Zêrker	ji	zêringer
Parsû	ji	peransû
Mestir	ji	mezintir
Şemdîn	ji	Şemsedîn

71. **Hevgirtin** Di nav diyarbûneyên hevgirtinê de meriv vana dibîne:

a) Ên ku ji rasthatinên tesadufî (daçek "ji", "li"... û pronav "zamîr", berlêker û lêker, û hwd.) çêdibin. Ên giringtirîn ji berê li jor hatin lêhûrnêrîn (bend 25, 27, 32).


b) Ên ku bi awakî hergavî di hundirê gotinan de, ji sedema ku di bend 66 de hat gotin, çêdibin. Encama (netîce) hemiyar rakirina hin tofên sabit ku ji dengdêran (bi awakî giştî, yê kurt) û dengdaran pêk bûne, û hiştina dengdêrên dirêj ên yekta (bitenê) ye.

Nexşeyên jêrîn bi hemberdayîna teşeyên (awa) ku di hin peyvîkên çiyayî de, ku bi awakî giştî kevnartir in (Botan, Hekarî, Behdînan û heta Tor Abdîn), kevn mane û takaneya (takane: tevayiya gotinên zimane-kî) zaravên deştan hatine pêk anîn. Jimar û wekhevîna nîşeyên ku hatin stendin weha ne ku dilê meriv dixwaze ku dozîneke (nazarîye) ku li gora wê ev guhertin merheleke pêşveçûna sîstema dengî ya kurdî dest nîşan didin (tesbît dikin) deyne. Metnên klassîk ên kevn ên gelek kêr, ku di destê me de ne, ji bo lêkolîna vê dozînê ne gelek alîkar in: Em hîn li benda weşanên wan ên zanyarî (ilmî) ne, û bi ser de jî ew pirr bi takaneya erebî û farisî nîşankirî ne.

"a" dêlva tofên "-eh-", "-we-", "-ehe-", "-ehi-" xuya dibe.

**Nîşe:**

Kanî	ji	kehnî
Patin	ji	pehtin
Danû	ji	dehnû
Daşik	ji	dehşik
Canî	ji	cehnî
Ra	ji	reh (rih)
Bajo	ji	behjo (raweya ferma-nî ya ajotin)



Bavêje	ji	behvêje (raweya fer-manî ya avêtin)
Bawer	ji	behwer (bawer kirin)
Şar	ji	şehir (bajar)
Panî	ji	pehnî
Paîz	ji	pehîz
Fam	ji	fehim (erebî فهم )
Xastin	ji	xwestin
Xwar	ji	xweher
Par	ji	behir
Tal	ji	tehil
Çav	ji	çehiv
Pan	ji	pehin

72. "E" di cihê tofên "-eh-", "-ehi-", "ey" xuya dibe.

**Nîşe:**

Rê	ji	reh
Bêvil	ji	behvil (poz)
Şê	ji	şeh (kej, porzer)
Rêl	ji	rehil (daristan)
Avêtin	ji	avehtin
Mêvan	ji	mehvan
Bêtir	ji	behtir
Rêtin	ji	rehtin (rijandin, be-lav kirin)
Çêlek	ji	çehlek
Pê	ji	pey (pî)
Kêf	ji	keyf (erebî كيف )
Elêh	ji	eleyh "dijî" (erebî عليه )
Hêv	ji	heyiv (hîv)
Mêw	ji	meyiw yan mehiw

73. "Î" di cihê tofên "-ih-", "-ihi-" û "-iyi-" xuya dibe.

**Nîşe:**

Tirî	ji	tirih
Bî	ji	bih
Cî	ji	cih
Pêçî	ji	pêçih
Sipî	ji	sipih
Sîwan	ji	sihwan (şemsiya ha-vînê)
Sî	ji	sih (siya darê)
Dîtin	ji	dihtin

Bibîne	ji	bibihne
Rîtin	ji	rihtin
Mî	ji	mih
Tî	ji	tihin
Mîvan	ji	mihvan (mêvan)
Gilî	ji	gilih
Bîn	ji	bihin
Dîn	ji	dihin
Hîv	ji	hiyiv

Di dawiyê de, tofa "-hi-", di destpêka gotinan de, gelek caran cihê xwe dide "î" (li bend 9, nîşank I binêre).

**Nîşank I.** Meriv dibîne ku tofa "-eh-" carna dibe "a" û carna "ê".

**Nîşank II.** Teşeyên yeksanî (muwazî), bidat yan hevgirtî, ku meriv di lîsteyên jorîn de dibîne, weka "mehvan" û "mihvan", ku dibin "mêvan" û "mîvan"; "heyiv" û "hiyiv", ku dibin "hêv" û "hîv", bi derbasbûna dúbare (gelek caran) ji "e" bo "î" û bi awayê vaja (ji "î" bo "e"), ku hîn di bend 10 de hati bû nîşan dan, tèn têgihajtin (fehm kirin).

Balkêş e meriv bala xwe bide ku gotinên biyanî yên kurdîkî eynî diyarbûneyên hev-girtinê yên gotinên ji rayê (esl) îranî distînin, weka di "fehm", "keyf", "eley" de. Nîşeyên weka wan di lîsteyên jêrîn de hene.

74. "O" cihê tofên -uh-, -we-, -wî-, -ih-, -wî-, -ihu-, -weyi- distîne.

<b>Nîşe:</b>	Gotin	ji	guhtin
	Ronî	ji	rihnî
	Ronahî	ji	rihnaî
	Cot	ji	ciht (dudu bi hev re)
	Sotin	ji	sihtin (şewitandin)
	Ordek	ji	werdek
	Go	ji	guh
	Son	ji	swind
	Kor	ji	kwîr
	Goz	ji	gwîz
	Stiro	ji	stirih (qiloç)
	Ajotin	ji	ajihtin
	Movik	ji	mihvik
	Motac	ji	muhtac (erebî عتاج)
	Don	ji	dihun
	Bost	ji	bihust
	Borîn	ji	bihurîn
	Xong	ji	xweying (xuşk)

75. "O" ji tofên -wî-, û pirr kêr caran, -ih- tê.

<b>Nîşe:</b>	Dûr	ji	dwîr
	Kûr	ji	kwîr
	Bûk	ji	biwîk
	Qûz	ji	qwîz
	Xûn	ji	xwîn
	Xûşk	ji	xwîşk (xuşk)
	Hûr	ji	hwîr
	Stûr	ji	stwîr

Tûj	ji	twîj
Şûr	ji	şwîr
Şûjin	ji	şihjin

**Nîşank I.** Tofa -ih- "o" û "î" jî dide; û -wî-, ku bi awakî giştî dibe "û", carna dibe "o".

**Nîşank II.** Gotinên ku di van nexşan de xuya dibin pîraniya caran weka rihên îraniya kevn, ku tê de tofine dengdêr û dengdar hebûn, in û weka hevgirtinên wan, ku nîşeyên jorîn ew nîşan dan (weka yên ku di bend 5 de hati bûn gotin), in. Lê gotinê din ji yên ku tê de bitenê dengdêrên dirêj hebûn tèn, weka: Dûr, dîtin, kanî û hud.

76. Bi awakî yeksanî yê van diyarbûneyên hevgirtinê, kurdî hêza xwe da ku, bi alîkariya cotan (gotinên cot, ango ku riha wan yek e, lê ku bi awayine cihê ketine nav zimên: Kor, kûr), rêzayên (mana) cihê ku carna di eynî gotinan de hebûn ji hevdu veqetîne: "Rê" û "ra", her du jî ji "reh" (rih) hatine.

"Kor" û "kûr". Di hin peyvîkên Bakurê Rojhilatî de rêzayê gotina "kwîr" di eynî zemanî de "kûr" û "kor" bû; ew hîn bi rêzayê yekemîn "kûr" heye, lê yê duyemîn bi vê pêşgotiyê tê dilniya (tekîd) kirin: "Ne çira ji kwîra re, ne duhêl ji kera re" (ne ronî ji koran re, ne dahol ji kerran re). Piştî hevgirtinê, "kwîr" dibe "kor" û "kûr".

"Rêtin" û "rîtin". Ji radereke (mesder) tenê, "rehtin" yan "rihtin", cotên "rêtin" (rijandin) û "rîtin" (destava mezin kirin) xuya dibin.

"Kêr" û "kîr". Teşeya kevn, "kehir" yan "kihir", "kêr" û "kîr", ku her yek ji wan bi rêzayekî cihê tê bi kar anîn, dan. Lê hîn di nav zaravên cihê de lihevhatin li ser nixê (qîmet) ku divê ji van her du gotinan re bê dayîn çênebûye: Bi kurmancî "kîr" organê cinsî yê zilaman e û "kêr" destgeha jêkirinê ye. Di vajayê vava de, bi soranî, "kêr" organê zilaman e û "kîr" destgeha jêkirinê ye.

Dûmahî heye



Qûz



# H Ê V Î

Amed

Bîra welêt kiri bû  
Sewda pir tiştan da bûyê  
Di ber çavên wî re  
Deştekan diçû, çiyale dihat  
Sewda ramûsana yarê  
Li bin siya hinarê  
Lî serê wî da bû  
Li kevçika dil xisti bû (1)  
Nema ji sewda ditebitî (2)  
Sewdek diçû, yek dihat  
Ba ji lêvan kuk nehat (3)  
Destek xiste bin serê xwe  
Pala xwe da kendalê jînê  
- Bawerî pê anî bû û pê tînê -  
Xwe tope hev kir.  
Destê dinê da ber henîya xwe  
Dûr-nêzik nêrî:  
Derya şîn germ û sore ji xwînê  
Pir kerr û kûre,  
Deşta beyar dirêj û dûre  
Çiyayê Mamend î liyane (4)  
Di bin hestiyên canemergan de  
Daketiye, êdî westiyaye  
Rabûye ser xwe  
Hilkişîye ser kendêl  
Guveguva bahoz û bê  
Nikarî bû ew tolkira jêr  
Dîna xwe dida jêr  
Devê wî digot: Çendî kûre!

Bala xwe dida hevraz  
Devê wî digot: Çiqasî bilinde!  
Zêna xwe dida aso (5)  
Devê wî digot: Çendî dûre!  
Wekî dinê,  
Hêviya dilê wî xurt bû  
Agirê sewda wî gurr bû  
Çend gav dane xwe  
Tu keser nedane xwe  
Şitlek xurme çand  
Baranek hêstir  
Li ber wê barand  
Bi rûyê geş  
Dev li ken  
Çend gotinên xweş  
Bi ber lêvan ket:  
Sala tê,  
Berdevê berbangê  
Ez tême ba te  
Li bin sersiya te  
Fîdana minê,  
Meşka xwe dikilêm  
Kêferatê dikim  
Xurmên te yên hunguvîn  
Tene, tene dixwim.

12. 7. 1984

- 1- Kevçika dil: Kortîka dil.
- 2- Tebitandin: Sebir kirin.
- 3- Kuk: Yekcar, zînar.

- 4- Liyan: Xwar
- 5- Aso: Ufuq.



# BELGELERDE NEWROZ

Nêrgiza TORİ


Newroz, Ari uluslarının her yıl 21 Martta bayram olarak kutladığı bir gün. Ne var ki bu gün, yine Ari olan Kürt ulusu tarafından ayrı anlam verilerek kutlanır. Bahar bayramı olarak kutlanan bu gün, Kürt ulusu tarafından direnişin, başkaldırının, zaferin simgesi olarak görülür. Oysa bu günde demirci ustası Kawa, Kürtlerin kutsal ateşini dağda yakarak halkını önderliğinde toplamış, boğa derisi önlüğünü sivri uçlu mızrağına asarak bayrak yapmış ve yıllarca zulüm etmiş, yüzlerce Kürt gencinin beynini omuzlarında çıkmış olan yılanlarına yedirmiş olan zalim kiral Dehak'ın sarayına yürümüş, tacını, tahtını başına geçirerek kiralıktan indirmiş, yerine yine bir Kürt prensi olan Feridun'u kiral tahtına oturtmuştur.

Bu bir mitolojidir. Kürtlerin kurtuluş mitolojisi. Bu mitolojide gerek demirci ustası Kawa, gerekse Kürtlerin kiralık tahtına getirip oturttuğu Feridun, tarih öncesi ile tarih arasındaki sınırdadır. Yani efsane ile tarih arasında. Biz bu olguyu efsane olmaktan çıkarıp tarihleştirme zorundayız. Daha net, daha belirgin. Onun için de olgunun objektif belgelere dayatılması gerekir.

Eldeki belgelerin gerek nitelik, gerekse siyasal olarak yetersizliği bize konuyu netleştirmeye yetmedi. Örneğin, bu olayda Kawa halkın baskıya, ezilmişliğe karşı olan sagduyusudur. Halkını simgeliyor. Bunu da tam olarak doğrulayan bir belgeye rastladık. Bu belgede, iynin kötüye karşı olan

savaşı (bu, Zaradustra'nın öğretisinin çekirdeğini oluşturmaktadır) denilmektedir. Demirci ustası Kawa, halkının savaşçısı, gerçek inançla, kötüyü simgeleyen Dehak'la savaşmış ve onu yenmiştir (\*). Ama bir başka belge Kawa'dan, simgelediği halktan söz etmemektedir. Oysa bu belge Pers mitolojisinden müslümanlık zamanındaki mitoloji tarihini oluşturan kiral kitabı Şahname'dir. Bu kitap aşağı yukarı M.S. 1000 yıllarında İranlı şair Firdawsî tarafından yazılmış, Gazne devleti hükümdarı Gazneli Mahmud'a sunulmuştur. Doğaldır ki bir hükümdara sunulan bir kitap halktan ve onun kahraman savaşçısından söz edilmeyecekti. İster istemez bu olaya, aşağıda olduğu gibi, bir hükümdara mal edilecekti.

Hamoza bitkisinin kutsal kurban olarak suyu sıkılmaktaydı. Bu su, din adamı atama ve kutsama ayininde kullanılmakta idi. Bu bitkinin suyunu sıkarak ilk dört adamın birer kahraman oğulları olmuştur. Bunlar Jima, Thraetona, Keresaspa ve Zaradustra'dır. İnanıldığına göre Jima kardeşi Spitjura tarafından ikiye parçalanmıştır. Ama daha sonradan onun da öldürüldüğü ve yerine de kiral olarak zalim Dehak getirilmiştir. Söylendiğine göre Dehak üç kafalı, altı gözlü, üç çeneli bir canavardı ve bu yalancı şeytan insanı doğru yoldan çıkarmak evlerini yıkmak ve onları ateşlendirip hastalandırmak için yaratılmıştı (resim 1). Bu Dehak daha sonradan Feridun diye tanınan Thraetona ile büyük bir savaş yapmıştır (resim 2). Thraetona onu öldüremeyince,



(\* ) Universele Wereld Geschiedenis, cilt 2, sahife 177.

sopasını ona saptamıştır. Ama bu kere yaralarından yılanlar, akrepler, kertenkeleler, kurbağa ve kaplumbağalar çıkmıştır. Thraetona bu iğrenç yaratıkların dünyaya yayılacağından korktuğu için Dehak'ı zincire vurmuş ve Demavend dağında bir yere kitlemiştir (resim 3).


Şeytan Dehak'ın dünyanın sonunda Demavend dağından kurtulacağı ve üçüncü olmak için de her yeri harab edeceğine inanılmaktadır. Onun için de **Keresaspa** insanlığı ve insanlık yaradılışını kurtarmak için yeniden canlanacak ve Dehak'ı sopasıyla öldürecektir. Keresaspa'nın şöhreti onun dini görevlerini aksatmış ve bu yüzden göklerdeki kutsal yere neredeyse kabul edilmecekti (\*\*).

Bilindiği gibi her yıl Newroz'un tarihi saptanırken M.O. 612 tarihi o yılın tarihine eklenerek hesaplanır. Orneğin bu yıl için  $1987 + 612 = 2599$  dir. Ne var ki Firdawsî'den günümüze gelen kitabı Şahname'ye göre Feridun, Zerdüşt (Zaradustra) ile yaşıt gösterilmektedir. Eldeki belgeye göre Zerdüşt'ün doğum yılı M.O 599/8, ortaya çıkışı, yani gatalarını (dua, ayin) yaydığı tarih 569/8, öldüğü tarih ise 522/1 dir (\*\*\*) . Kral Feridun'un tahta çıkışını Zerdüşt'ün ortaya çıkış yılında alırsak, Newroz'un tarihini hesaplamada 569 yılından sonraki bir yılı Newroz'a başlangıç olarak almamız gerekir diyorum. Oysa 612 yılı da bu olaya başlangıç olarak alınması gerekir. Bu yıl bir kurtuluş yılı değil, Kürtlerin ataları olan Med'lerin ve Med devletinin tarihinin doruk noktasında olduğu bir yıldır. Bu yılda, yani 612 yılında Med kralı Key Aksar (625-585) Assur devletinin başkenti olan Ninova şehrini kuşatarak, kanlı bir çarpışmadan sonra aldı. Böylelikle bin yıllık Assur devletini ortadan kaldırdı. Bu olaydan sonra da Med devleti İmparatorluk aşamasına ulaştı. Demek oluyor ki Newroz mitolojisinde geçen kurtuluş olayı bu yılda olması gerek. Her ne kadar bu tarihten dokuz yıl önce, yani M.O. 623 yılında Med kralı Key Aksar ile İskitler arasında bir olay geçmiş ise de, bu olay Newroz mitolojisinde anlatıldığı türden bir olay değildir. Tarihi belgelerde yer aldığına göre (\*\*\*\*) Med kralı Key Aksar Ninova'yı ilk kez M.O. 623 yılında kuşattı. Kuşatma sırasında Ari olmayan, M.O. 642-615 yılları arasında 27 yıl Asyayı egemenlikleri altına alan İskit'lerin Med ülkesinin kuzeyini istila ettikleri haberi geldi. Bu haber üzerine Key Aksar Ninova'nın kuşatmasını yarıda bırakarak İskitlerin üstüne yürüdü. Çok

uzun süren ve kanlı geçen çarpışmalardan sonra Key Aksar İskitleri yenemedi. Onlara bazı ödünler vererek bir antlaşma imzaladı. Ne ki İskitler yine de boş durmuyor, sürdürdükleri yağmalama eylemlerine devam ediyorlardı. Bunun üzerine Key Aksar M.O. 615 yılında bir içkili ziyafet hazırlayarak tüm İskitlilerin ileri gelenlerini yemeğe çağırdı. Yemekte verdiği içkilerle tüm İskit'li şefleri sarhoş olmalarını sağladı. Bu sırada tümünü kılıçtan geçirdi. Geri kalanlar da bu olaydan sonra Med ülkesini terk ederek komşu Lidya ülkesine sığındılar. Bu olay bu tarihten, yani 615 yılından itibaren Med'ler ve onların torunları olan Kürt'ler arasında bayram olarak kutlanmaya başlandı.

Yukarıda anlatılan olay tarihi diğer belgelere geçmiş bir konu. Ne ki bunun da konusu Kawa destanına benzemektedir. Ancak yıl olarak 612 yılına yakın bir olaydır.

Bu olayın daha bir detaylı incelenmesi gereğine inanıyorum. Bunu da doğal olarak tarihçilerimize bırakıyorum.



(resim 1)

(\*\*) Veronica LONS, De Mythologie Van De Wereld, sahife 55-66.

(\*\*\*) Universele Wereld Geschiedenis, sahife 136.

(\*\*\*\*) Ekrem Cemil Paşa, Muhtasar Kürdistan Tarihi, cilt I.

# TIRKIYE XWAZGÎNA C.E.E. YE?

Nuriddîn ZAZA (\*)

Tirkiye pîrr tecrube dike ku xwe weka welatekî dêmokratîk nîşan bide, ji bo ku ew hêvî dike ku bikeve nav CEE (Kommissiyona Aborî ya Ewropî), weka ku Ispanya, Portugal û Yûnanistan nuh vê yekê kir.

Lê pîrsek tê kirin: Gelo Tirkiye dikare bi rastî iddia bike ku ew "welatekî dêmokratîk" e? Bersiva me na ye. Sedema vê yekê ev e:

Dewleta tirk a nuha, ku di 1923 de ji aliyê Mustafa Kemal hat ava kirin, di xêzên xwe yên mezin de ji idêolojiya ku evê dawîn pêk anî û ku navê wê **kemalîzm** e, ilham distîne. Ev idêoloji li ser çend tîzên ku emê li jêr bi kurtî bêjin ava bûye:

**Bilindbûna nijadê tirkî** (nîşe: Zimanê tirkî kaniya hemî zimanan e, dozîna "nazarîye" zimanê tav). Tirk ji herdem li Rojhilata Navîn rûdinên û ew kevntirînên şareyariyan "medeniyet", weka Hittît û Sûmir, bûn.

Li Tirkiyê bitenê Tirk rûdinên û yên ku vajayê (eks) vava iddia dikin divê ku bi her awayî ji nijadkujiya (jênosîd) çandî heta ya canî, bîn tirk kirin.

Kurd (îro ew li vî welatî nêzîkî 15 milyon in) tevayîyeke netewî ya cihê ava nakin: Ew ji rayê (esl) Tirkan bixwe ne; zimanê wan bitenê peyvekekî tirkî ye. Û eger Kurd biwêrin dilniya (tekîd) bikin ku ew xwedyên dîrok, ziman û çandê (ku ew îro di mezintirînên zanîngehên Ewropa û Emerîka de tîz hîn kirin) cihê ne, helbet ew ji aliyê "biyaniyan" hatin daf dan. Loma pêwîst e ku ew di kurttirînên deman de bîn tirk kirin.

Ev dogmên nijadparêz û ne mantiqî bûne tîzên fermî (resmî) ku bi qîrînên bilind ji aliyê berpirsiyarên tirk di dibistan, zanîngeh û weşanên Tirkiyê de tîz îlan kirin. Zagonên (qanûn) hişk, ku bi hêzanî ji zagona Mosolînî hatine stendin, ji bo sezadana (cezakirin) serhişkan hatin derxistin.

Kurd li hemberî vê rêzanê (siyaset) çi dikin?


Di dema ku Kurdên cuhan dijî rêzana kemalîst tîkoşînê dikin, civakzanê (sosyolog) tirk, assîstanek li Zanîngeha Erzûrûmê, li Kurdîstana Tirkiyê, Ismaîl Beşikçi, derket meydanê. Li gel ku ew weka hemî Tirkan, ji aliyê propaganda fermî bijar

bû bû, wî zû dît ku rewşa rast a gelê kurd ne weka ya tîzên fermî bû. Wî xist serê xwe ku valabûn û rewîştê (karaktêr) ne mantiqî yê rêzana assîmilasyona bi zorê ku ji aliyê destelatên (iktidar) tirkî li hemberî gelê kurd tê ajotin ronî bike.

Zû, lêgerînên wî yên zanyarî (ilmî) ku ji 1969 hatin weşandin destelatên zanîngehî û rêzanî di endîşeke mezin de hiştin. Di 1970 de, ewê ji Zanîngeha Erzûrûmê bê dîr kirin û, di 12 Adar 1971 de, dema ku leşker tê hikm, ewê bi hezaran Kurdên ku, ji dîr yan nêzîk, beşdarî tevgera daxwaziyên nasyonalfîst bibin re bê girtin.

Beşikçi ewê bê hikm kirin, sezayê sêzdeh salan girtin bistîne û li Adanê bê girtin.

Di 1973 de, dema ku sîvîl vedigerin hikm, Beşikçi ji buhurandineke (efû) giştî kelk digire (istifade dike). Ewê di mijûlbûna xwe bi doza (dawa) kurdî de dewam bike. Piştî weşandina pirtûka xwe "**Mêtođa Zanîne**" (tehlîleke zanyarî ya pîrsa kurdî) di 1976 de, ewê pirtûkine din jî bîn: "Sîrgûnkirina Kurdan û xaniyê wan ê kontrolkirî", "Têza tirkî ya dîrokê û pîrsa kurdî". Ev ji bo destelatên tirkî êdî zêde ye. Ew wî digirin û dibin dadgehê (mehkeme) Beşikçi sezayê (ceza) sê salan girtin distîne û di Îlona 1979 de tê girtin.



(\*) Nivîskar ev gotar di rojnama swîsrî, 24 Heures, 20-21 Kanûn 1986 de bi fransîzî nivîsiye. Wergerandin: Pervîn.

Ev girtin dibe sedema kampanyeke mezin ji bo berdana wî. Li Swîsra, Mme Mousse Boulanger, bi navê Şirketa swîsrî ya nivîskaran, tê de pareke aktîf stend. Di dawiyê de, civakzanê tirk di 12 Nîsan 1981 de hat berdan. Serbestiya wî kurt bû, ji bo ku piştî demeke kurt destelatên leşkerî di zindana wî de kopya nameya ku Beşikçi ji Şirketa swîsrî ya nivîskaran re nivîsî bû û ku tê de wî êrîşî bingeha kemalîzmê dikir û hebûna xweyîyeke (şexsiyet) kurdî li Tirkîyê dipejirand (qebûl dikir) dît.

Ev jibîrkirina bextreş bû sedema yazdeh sal û nîv girtin "ji sedema daxistina preştîja Tirkîyê li derve".

Nivîskar û civakzanê tirk hat sirgûn kirin bo girtîgeha Antebê, yek ji gemartîrîn û hişkîrînên girtîgehên Tirkîyê. Ew îro hîn jî tê de ye. Jê re xwendin û serdana (ziyaret) hevalan qedexeyê. Lê moralê wî hîn ji pola ye û Beşikçi qet niyeta wî tu neye ku rateke (durum) dijî baweriyên xwe yê merivekî zana bistîne. Ji bo wî, Tirkîye, welatê ku ew jê hez dike, nikare dêmokrasî, aşîfî û dewlemendiyê bibîne bê ku dev ji rêzana tirkîkirina gelê kurd berde.

Lê îro rewş li Tirkîyê çi ye? Destelatên

ku hîn bi kemalîzmê dogmkirî ne xuya ye ku ne amade ne ku guhdariya Beşikçi û hesaba rastiyê bikin. Du sêyekên leşkerê tirk li Kurdîstana ku tê de gelhe di tirsaya mezin de dijî ne. Gundên seranser hatin vala kirin û rûniştevanên wan ber bi Rojhilatê sirgûn kirin... Girtîgeh tije ronakbîr û gundiyên welatparêz in.

Ez li ser êşandinên ku tê de tîrî kirin û ku bi xeyal û kirêtiyê konkurans (yarîş) dikin ranawestim. Ez bitenê vê bûyera ku di rojnama tirkî Hurriyet, a 20 Hezîran 1986, de hat weşandin bêjim:

"Wan ji me re du seetan gû da daqurtandin. Hevalê min ê zindanê, Bedri Tan, di bin êşandinê de mir. Ji bo ku ez vê kirêtiyê ji bîr bikim, min hemî diranên xwe da kişandin...". Navê nivîskarê van rêzan Ferat Cemiloglu ye. Ew serokê Oda Bazarganî û Pîşesaziyê (sinaet) ye....

Sefaletê weha, ku di 1986 de hatiye kirin, heqareteke weha ji bo rûmeta mirovî, ku ji welatekî "ewrupî" (ango medenî) tê, bi bawerîya min ne muhtacê tu tefsîr e.... Îcar, ez vê pirsê ji nuh de dikim: Gelo Tirkîye dikare bi namûsî iddia bike ku têkeve C.E.E. ?

Samedi-Dimanche 20-21 décembre 1986

24 heures

s.z. 45

24

EN LIBERTÉ

## La Turquie candidate à la CEE?

**L**A Turquie s'évertue à se faire passer pour un pays démocratique car elle aspire à adhérer à la CEE ainsi qu'elle l'ont fait récemment l'Espagne, le Portugal et la Grèce.

Mais une question se pose: la Turquie peut-elle légitimement se prétendre « pays démocratique »? Notre réponse est non. Voilà pourquoi:

Nouredine Zaza

Auteur de « Ma vie de Kurde »  
Bussigny-près-Lausanne

# Parti pris

L'Etat turc actuel, fondé en 1923 par Mustafa Kemal, s'inspire, dans ses grandes lignes, de l'idéologie élaborée par ce dernier et nommée kémalisme. Celle-ci se fonde sur plusieurs thèses que nous résumerons ci-dessous:

Supériorité de la race turque (la langue turque serait, par exemple, la source de toutes les langues, théorie de la « langue soleil »). Les Turcs habiteraient depuis toujours le Moyen-Orient et auraient été les plus vieilles civilisations, telles que les Hittites et les Sumériens.

La Turquie n'est habitée que par des

Les Kurdes (aujourd'hui environ 15 millions dans ce pays) ne constitueraient pas une entité nationale à part: ils seraient de la même origine que les Turcs; leur langue ne serait qu'un patois turc. Et si les Kurdes osent se permettre d'affirmer qu'ils possèdent une histoire, une langue et une culture distinctes (enseignées aujourd'hui dans les plus grandes universités d'Europe et des Etats-Unis), c'est naturellement parce qu'ils ont été poussés par « l'étranger »... Aussi importe-t-il de les turquiser dans les plus brefs délais.

Ces dogmes racistes et irrationnels sont devenus des thèses officielles proclamées à hauts cris par les responsables turcs dans les écoles, les universités et dans les médias de Turquie. Des lois sévères, inspirées plus particulièrement du code mussolinien, ont été promulguées pour châtier les irréductibles.

Comment les Kurdes réagissent-ils face à cette politique?

Tandis que de jeunes Kurdes agissaient contre la politique kémaliste, on vit surgir un sociologue turc, maître assistant à l'Université d'Erzurum, au Kurdistan turc: Ismail Besikçi. Bien qu'ayant, comme tous les Turcs, été intoxiqué par la propagande officielle, celui-ci ne mit pas longtemps à constater que la réalité du peuple kurde ne correspondait pas aux thèses officielles. Il se mit en tête de révéler l'absurdité et le caractère illogique de la politique d'assimilation forcée menée par les autorités turques à l'endroit du peuple kurde.

Bientôt, ses recherches scientifiques, publiées dès 1969, alarmeront les autorités universitaires et politiques. En 1970, il sera limogé de l'Université d'Erzurum et, le 12 mars 1971, lors de l'arrivée au pouvoir de l'armée, il sera arrêté avec des milliers de Kurdes engagés, de loin ou de près, dans le mouvement des revendications nationales. Besikçi sera jugé et condamné à treize ans de prison et incarcéré à Adana.

En 1973, au moment où les civils reviennent au pouvoir, Besikçi profitera d'une amnistie générale. Il continuera à s'intéresser à la cause kurde. Après la publication,



Le sociologue turc Ismail Besikçi croupit toujours dans la prison d'Antep, une des plus dures de Turquie.

veillée ». « La thèse turque de l'histoire et la | Cette arrestation suscitera une vaste cam-

# D Î R O K A   K U R D Î S T A N Ê   D Î

- VIII -

## C. Ji 1920 heta rojên me

Şerrên mezin (1914-1918) gelek tevliheviyên rêzanî (siyasî) anîn Rojhilata Nêzîk û Navîn. Welatên ereb (Sûriye, Lubnan, Filistîn, Urdun, Iraq) ji imperatoriya osmanî diveqetin. Sultaniyet di 1922 de tê rakirin, Komara Tirkîyê di 23 Cotmeh 1923 de tê îlan kirin û Xilafet di 3 Adar 1924 de tê hilanîn. Di dawiyê de, Konseya S.D.N. (Civaka Netewan) wilayeta Mûsilê di 26 Kanûn 1925 de dide Iraqê. Ji aliyê xwe, General Riza li Farisistanê malbata qralî ya Kacaran dixist xwarê û malbata Pehlewî di 23 Cotmeh 1925 de ava dikir. Ev rastkirinên sînoran rewşa Kurdan tevlihevtir dikin. Kurd, ji dêlva ku di bin du hikûmetan bitenê de: Imperatoriya osmanî û imperatoriya farisî, bijîn, ji nuha û pê ve xwe di nav pênc welatên cihê de perçekirî dibînin: Tirkîye, Iran, Iraq, hindikayiyine giring li Sûriyê û çend tof (kom) li welatên Piştî Qefqasya Sovyêtî: Ermenistan, Gurcistan û Azarbaycan. Ji nuha û pê ve çarenûsa (qeder) wan li gora Dewletên cihê ku wan war dikin (dihewînin) bi awayên cihê diguhere.

**ÇAVKANIYEKE GIŞTÎ:** F. de Richemont, Minorités du Proche-Orient, le problème des Kurdes, di Rev. polit. et parlementaire, CLXXV (1938) de; L. Rambout, les Kurdes et le Droit. Des textes. Des Faits, Paris 1947; Memorandum sur la situation des Kurdes et leurs revendications présenté à l'ONU, Paris 1948; W. G. Elphinston, The Kurdish Question, di JRCAS, XXX/1 (1948), 38-51 de; B. Nikitine, Les Kurdes, Essai sociologique et historique, Paris 1956; S. S. Gavan, Kurdistan, divided Nation of the Middle East, London 1958; J. Joseph, The Nestorians and their Muslim Neighbours. A Study of Western Influences on their Relations, Princeton (N.J.) 1961; J. Blau, Le problème kurde, Essai sociologique et historique, Bruxelles 1963; D. Kinnane, The Kurds and Kurdistan, London 1964; A. Qasimlû, Kurdistan and the Kurds, Pragues-London 1965; H. Arfa, The Kurds. A historical and political Study, London 1966; I.C. Vanly, le Kurdistan irakien. Etude de la Révolution de 1961, Neuchâtel 1970 (Bibl. 390-414).

## L I T I R K I Y Ê




Hema ji şerrê cihanê yê 1mîn û di dirêjayiya gotûbêjên li ser Mûsilê, hin welatparêzên kurd, ku hêviyên wan ji bo Kurdistanê serbixwe ku Peymana Sêvres (10 Tebax 1920) destnîşan da, lê ku ji aliyê Peymana Lausanne (24 Hezîran 1923) hat rakirin, vemirîn, tevliheviyan derxistin. Di dema gotûbêjên dirêj li ser Mûsilê de, Şêx Seîd Neqîşbendî yê Pîran li navçeyên Urfa, Sîwerek, Diyarbekir serê xwe hilda, ji sedema fanatîzma olî (dînî) û hurmeta xilafetê (Gentizon) yan ji handana (teşwîq) Ingilterê (Mustafa Kemal). Şêx zû hat girtin, ji aliyê dadgehên (mehkeme) Serxwebûnê (Istiklal) (Nîsan-Hezîran 1925) hat

(\*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

# A N S Î K L O P Ê D Î Y A İ S L A M Ê D E (\*)

hikm kirin û li Diyarbekrê tevî 53 serhilên din hat daleqandin. Hemî doz (dawa) ji aliyê rojnama tirkî Vakit, ji 20 Nîsan 1341/1925 heta 28 Hezîran, ku tê de li ser rengdêra (sifet) nasyonalîst "milliyetçi" ya kurdî ya tevgerê tê li ber dan (îsrar kirin), hat taqîb kirin. Şkestina tevgerê serokên kutabûyî (ên ku xelas bûn) neçar (mecbûr) hişt ku pena bibin (iltica bikin) welatên biyanî.

Di 3 Cotmeh 1927 de, Lîga Netewî ya Kurdî, Hoybûn (Serxwebûn), bi yekkirina hemî komite yan komelên kevn, hat ava kirin. Ihsan Nûrî Paşa yê Bitlîsê generalê bilindtirîn hat teyîn kirin, û Sazendeyeke şareyarî (medenî, sîvîl) hat pêk anîn. Heta gotûbêj bi nûnerên hikûmeta tirk re di îlon 1928 de, li Şeyhli Köprü, hatin çêkirin, bi soza bihurtina (efû) giştî ji bo kesên ku keti bûn tevgerê. Çend Kurdên ku xwe nîşan da hatin kuştin. Ji wê çaxê, serhildana Çiyayê Agirî (Ararat), 1930-2, di beharê de teqiya. Ji aliyê leşkerî baş rêkûpêkkirî (organîzekirî), leşkerên kurdî, ku piştî wan ji aliyê êlina (eşîr) li navçeya Diyarbekrê hati bû girtin, gihajtin çend serfiraziyên çirisî, lê di dawiyê de, di bin şelpeyên (darbe) leşkerê tirk ê bi 45.000 zilaman xurt û xwediye destgeheke (matêryal) top û balefiran a nûjen (modêrn) de, hat şikestin. Enternasyonala IImîn, di civîna xwe ya Zurich de, biryareke komîta xwe ya birêvebir, ku aliyê gelê kurd digirt weşand (Cild VII, N° 60, 30 Tebax 1930). Rata (durum) Sovyêtan di wê heyamê de bi awayên cihê ji aliyê Agabêkoff di Mémoires de, ku bi fransîzî di 1930 de hatin weşandin, û M. A. Kondkarian di rojnama rûsî ya Parîsê, Dnî, 31 Tebax 1930 de, hat tefsîr kirin. E yekemîn li ser tevgerê sovyetî di nav Kurdan de û ku ji Tauris, ji aliyê merivekî bi navê Minossian ku nûnerê G.P.O. bû hat ajotin, dipeyive. E duyemîn, di vajayê (eksê) vava de, dilniya (tekîd) dike ku Tirkan alîkarî û piştgiriyeke mukemmel ji aliyê bolsêvîkên rûs dîtin. Ji 1931 heta 1934, veciqînên katî (muweqqet) li Menemen, Erzurûm, Diyarbekirê tînen hest (hiss) kirin, û di rêzeke gotarine Hakimiyetî Millî de Burhan Assaf Bey planên ermenî-kurdî kifş dike. Zû zagoneke (qanûn) tirkî, ku planeke pêkanîna rast a Kurdan ber bi hundirê Tirkîyê amade kir, di 5 Gulan 1932 de hat derxistin. Lê ev zagon bitenê piştî serdana




(ziyaret) Şahê Iranê bo Ankarê di havîna 1934 de tê bi cih anîn. Lê ji nuha û pê ve li Tirkîyê nema Kurd hene. Hemî rûniştevanên navçeyên rojhilatî ji nuha û pê ve weka "Tirkên çiyayî" tînen hesab kirin.

Ev çewtiya psîkolojîk û pişavtina (as-similasyon) Kurdan bi zorê di 1937-8 de serhildaneke nuh, ku navenda wê navçeya çiyayî ya Dersîmê ku tê de Kurdên Zaza rûdinên bû, rakir. Seyyid Riza, şêxê terîqa Neqîşbendî, serê wê kişand. Ev serhildan ji bo Kurdan a diwartirîn bû, ji bo ku ew bi awayê hişktirîn ji aliyê Tirkan hat pelixandin. Piştî darvekirina Şêx û deh ji hogirên wî li Elazîzê, di 15 Mijdar 1937 de, Tirkan Dersîmê ji nexşê rakir û di cihê vî navê reş de navê Tuncelî danî. Kurd ji takaneya (tevayîya gotinên zimaneke) fermî (resmî) hunda bûn û ev navçe heta 1946 di bin zagona leşkerî de ma.

Ji wê gavê, nema serhildanên leşkerî li Tirkîyê çêbûn. Kurdistan di dirêjayîya şerrê cihanê yê duyemîn de, ku jixwe Tirkîyê tê de bêalî bû, bêdeng ma. Di encamê (netîce) de, hikûmet ji navçeyên kurdî re hinek nerm bû. Lê ronakbîr hergav ji nêzîk de dihatin taqîb kirin. Heta 49 ji wan di 1959 de hatin girtin û bi veqetînxwaziye "bölücülük" hatin sûc kirin. Piştî şelpe

leşkerî di 27 Gulan 1960 de, Destûreke nuh a serbesttir hat danîn. Li gel hin daxwaziyên kesên fermî (ku di rojnama swêdî Dagens Nyheter, 16 Mijdar 1960 de hatin nivîsîn; li C.E.K. N° 12, 8 binêre), hin gotar li ser Kurd û Kurdistanê karî bûn di çapa tirkî de, di navbera 1965 û 1968 de, derkevin, kovarine bi du zimanan, tirkî-kurdî: Dicle-Firat û Deng, rêzimana kurdî, ferhengeke kurdî-tirkî, şanoyek: Birîna reş, û helbesta klasiîk a dirêj Mem û Zîn rojê dît. Lê li herder kovar hatin qedexa kirin, berhemên (eser) weşandî dihatin stendin û nivîskarên wan dihatin taqîb kirin. Bi ser de jî, ji bo dîrxistina her gihajtineke bûyerên Kurdistanê Iraqê, ku ji çend salan di tevgerê de bû, biryareke serokî ku di rojnama fermî N° 12527 a 14 Sebata 1967 de hat weşandin digot: "Illêgal û qedexa ye ku her weşan, sîlik yan kasetên biyanî û bi zimanê kurdî, bi çî awayî be, bî xistin nav welêt û bî belav kirin". Gotarine tûj dijî Kurdan di kovara nasyonalîst a tirkî Otûken de (N° 40, Nîsan 1967, N° 42, Hezîran 1967; ku di Vanly, Kurdistan irakî, 298-300 de hatine gotin) xuya dibin. Ev yek digihîne bersivdayîna komelên xwendekaran di 19 gundên kurdî de. Wan vê ratê protêsto dikir û wê dijî bend 12 ya Destûrê û bend 37-44 ên Peymana Lausanne (1923) didît. Di Nîsana 1970 de, tevgerine hov ên polis li bajarê Sîlvanê, li navçeya Diyarbekirê, bûn sedema protêstoya xwendekarên kurd û tirkên libêral (li Milliyet, Hezîran-Tîrmeh 1970 binêre) û pîrsa nûnerê gel (millet vekili) ê kurd, Mehmet Ali Aybar, serokê kevn ê Partiya Gel a Tirkîyê (TIP) li ber Parlamentoyê. Kongra 4mîn a TIP (29-31 Cotmeh 1970) di biryarekê de, mafê jînê ji bo gelê kurd li Tirkîyê dîpejîrîne (qebûl dike) (Vanly, Survey, 51-4). Ji xeynî aliyê etnîk û rêzanî, xuyaye ku ji nuha û pê ve pîrsa aborî û civakî divê rolekê di çara pîrsa kurdî de li Tirkîyê bilîze (Rambout, 23-44; Nikitine, 196-8; J. Blau, 35-40; Qasimlû, 50-62; Arfa, 33-46).

**ÇAVKANI:** Sh. Sekban, Kurdler Türklerden ne istiyorlar, Qahire 1923; nivîskar bixwe, La Question kurde. Des problèmes des minorités, Paris 1933; P. Gentizon. L'insurrection kurde, di Rev. de Paris, 15 Cotmeh 1925 de; nivîskar bixwe, Mustafa Kémal ou l'Orient en marche, Paris 1929; H. C. Armstrong, Mustafa Kemal. An intimate study of a dictator, London 1932 (wergerandina fransîzî, Paris 1933); Kurd Oglu, Kurdî i imperialism, di bultena Pressî Srend. Vostoka, Taşqend 1932, N° 13-14, 94-118; M. Pogorelov, Kurdskaa vopros, di Voyna i revoliutsiya, III (1925), 138-53 de; Hoybûn, Qahire N° 2 (1928), Les massacres kurdes de Turquie; Bletch Chirguh, La question kurde, ses origines et ses causes, di Hoybûn, N° 6 (1930) de; H. A. Gibbons, The case of Kurdistan against Turkey, Princeton (N.J.) 1929; R. Forbes, Conflict Angora to Afghanistan, New York 1931; M. Fany, La Nation kurde et son évolution sociale, Paris 1933; J. L. Nehru, Glimpses of World history, 2 cild, Allahabad 1935; Ahmed Rechid, Les droits minoritaires en Turquie dans le passé et dans le présent, Paris 1935; Anon. La Turquie devant la question kurde, di Le Temps, 13 Tebax 1937 de; R. A. von Kral, Das Land Kamâl Atatürk, Vienna-Leipzig 1935; Abd El-Aziz Yâmulkî, Kurdistan Kurd ihtilali, Begdad 1947; Şarîf Firat, Dogu illeri ve Varto Tarihi, Ankara 1945, 1961; M. N. Dersimi, Kürdistan tarihinde Dersim, Heleb 1952; S. Ustüngel, Savaş yolu, the road of struggle, wergerandina rûsî, 1951, wergerandina çîkî, 1952, wergerandina almanî, 1953; Behcet Cemal, Şeyh Sait Isyani, Istanbul 1955; R. Hilmî, Makalat, Begdad 1956; Anon, Tasnak-Hoyboun, Ankara 1931; Centre d'Etudes Kurdes (C.E.K. Paris) N° 12 (1961), La Turquie moderne face au Kurdistan de la Turquie, N° 13 (1961), L'épreuve kurde; I. C. Vanly, Survey of the National question of Turkish Kurdistan with historical background, s.l. 1972.





Rewşa Kurdan hergav ji ya ku ji wan re li Tirkîyê hat çêkirin cihê bû. Bi rastî, hikûmeta Îranê li ber nêzîkbûnên nijadî û dîrokî ku her du gelan yek dikin dide (îsrar dike). Lê ev nabe asteng (engel) ji bo carcaran derketina nexweşiyên rêzanî û civakî, û divê meriv nahezîyên ku gelek caran veşartî û carna xwînî ne têbibîne (bala xwe bide). Hîn di dirêjayiya Şerrê Mezin de, navçeya Azarbaycana Bakurê Fari-sistanê ji aliyê tevgerên leşkerên tirkî yan rûsî li ser vî xakî (erd) tevlihev bû bû. Serokê Şikakan, İsmâîl Axâ Sîmko, ji wan kelk girt (istifade kir) ji bo ku tecrube bike ku ji xwe re Dewleteke piçûk a kurdî ku ew serê wê bikişîne bitirêşe (jêke). Bi vî awayî, ew di yekkirina êlên kurdî yên Bakurê welêt de, di bin serokati-ya xwe de, serfiraz bû û çend caran Tirk, Aşûrî, leşkerên Îranî şikandin, û li gora rewşan hevalbendên xwe diguherandin. Bi vî awayî ew bû destelata (qudret) yekta (bite-nê) ya navçeyê, li Rojavaya gola Urmîyê, ji bo ku li dawiyê ew li Uşnu ji aliyê İrani-yan di 21 Hezîran 1930 de bê kuştin (Arfa, 48-54), bi eynî awayê ku wî Patrikê Aşûrî Mar Şîmun Benjamin di 3 Adar 1918 de kuştî bû (Joseph, 140-1).

Ji aliyê xwe jî, li Başûrtir, li navçeya Kurdistanê, Salar El-Dewle Kacar, ku bi jinanîn bû bû merivê malbatên mezin ên kurd ên Sanandajê, serê xwe hilda, lê ew hat şikestin. Hîn serokên kurd ne pejirand ku çekên wan ji wan bîstendin, û bitenê di 1930 de Cafer Sultan serê xwe xwar kir (Arfa, 64-7; Qasimlû, 73-5).

Lê şerrê cihanê yê duyemîn diviya ku kartêkirineke (tesîr) wî ya mezin li ser netewevîna (nasyonalîzm) kurdî li Îranê hebe. Bi rastî, vegirtina (işgal) navçeyên Bakur û Rojavaya welêt ji aliyê leşkerên sovyetî û ingilîz (25 Tebax 1941), ku piştî wê Rîza Şah Pehlewî xwe ji ferdandariyê (hikm) kişand (16 İlon, 1941), bi qelskiri-na destelata navendî ferzend (firset) da tevgerên pêşveçûnê. Gelek mehan, leşkerê İranî diviya ku bi dijwarî li hemberî Hama Reşîd Xan û Baneh ku, bi alîkariya gelek êlên hawsê (cîran), bû bû serokê navçeya Serdeşt-Baneh-Merivan, di havîna 1942 de, raweste (Arfa, 67-70). Lê ev yek bitenê destpêka tevgerê rast a serxwebûnê bû. Di destpêkê de, Kurd ji rewşê kelk girt ji bo ku di vî zewiyê (erd) vala de (no man's land), ku tê de destelata navendî hunda bû bû (1942), ji bo ku rêxistineke Komelayî Jiyanî Kurdistanê ava bikin (Eagleton, 34). Ev komela netewevînî, lê hinek paşverû, ji ronakbîrîne bajarî û burjuwaziyine piçûk ên Mahabadê, Sawc-Bûlaka kevn, lê ku zû şêx û serokên êlan xwe gihand wê, ava bû bû. Zû,



Qazî Muhammed, ji êleke giregirên dewlemend û bixwe avukat, bi rêza (dor) xwe xwe gihand wê (Cotmeh 1944) û, hema piştî şerr, hemîyan ferzendê baş dît û di 22 Çile 1946 de Komara Kurdî ya Mahabadê îlan kir, li hundirê Komara Otonom a Azarbaycanê ku li Tebrîzê bi cih bû bû. Bi rastî, Qazî Muhammed otonomiyê hundirî di nav çarçeva imperatoriya İranî de bêtir dixwest. Ev Dewleta piçûk, a aqara kurtkirî, li Rojava û Başûrê gola Urmîyê, baş rêkûpêk bû; tê de dibistan û nexweşxane hatin vekirin, pirtûkên klassîk û kovar bi zimanê kurdî hatin weşandin, hêz hat dayîn ji bo pêşvebirina çînî (ziraet), bazarganî (ticaret), pîşesazî (sinaet) û saxiyê. Leşkerekî piçûk ji regezên (unsur) êlî, tevî çar generalên ku ji wan Melle Mustafa Berzanî, ku nuh ji Iraqê tevî leşkerê xwe yê baş destgehkirî yê çekdaran hati bû, hat pêk anîn. Lê gava ku leşkerê rûsî, ku piştî Komara Otonom a Azarbaycanê digirt, zewiyên İranî berdan (Gulan 1946), hikûmeta Tehranê navçeyên serhil ên Bakurê welêt ji nuh de stendin. Qazî Muhammed xwe xwar kir, lê di berbanga 31 ADAR 1947 de, tevî gelek serokên din, hat daleqandin. Komara kurdî ya Mahabadê yazdeh mehan ajoti bû. Lê vê bûyerê dengê xwe yê bilind li ba hemî Kurdan da bihîstin (Arfa, 70-102; Qasimlû, 76-82; Rambout, 94-108, û bi hêzanî Eagleton). Ji wê gavê, di İlon 1950 û Sebata 1956 de, ji bo sedemên aborî, êla Cavanrûdî ji aliyê leşkerên Şah hat êriş kirin û bi hişkî pelixandin,

bi behana ku wê ne dixwest ku bac (vergi) û çekên xwe bide û ku xwe dida çiniya heşîşê. Li gora Rondot (Vie intel., 1956, 107-9), serfiraziya vegirtina leşkerên îranî encama yekemîn a pozîtîf a Peymana Begdadê bû (1955). Ji dema van tevliheviyên dawîn, hikûmeta Iranê, bi rêformên civakî yê avaker, hêza xwe da kişandina hezkirin û heta piştgiriya gelheya xwe ya kurdî ya mezin. Ji bo vê gelhê, wê li Tehranê, ji Gulan 1959 heta Gulan 1963, kovara hefteyî Kurdistan, ku tê de bi kêrhatiyî li ser bêje (edebiyat), ol (dîn), zanistî (ilm), dîrok û heta rêzanê jî dihat nivîsîn, weşand. Piştî hikûmeta Iraqê ya Iranê sê kir ku wê bi awakî maddî û manewî alîkariya serhildana Kurdan li Iraqê kir. Lê ev rata rêzanî qet rata bigûman ya destelatên îranî li hemberî Kurdan xwe ne guherand.

**ÇAVKANÎ:** P. Rondot, Les revendications kurdes, di ETI, 1946/2, 114-20 de; nivîskar bixwe, Le mouvement national kurde en 1964, 1947/2, 128-141; nivîskar bixwe, L'expérience de Mahabad et le problème social kurde, mai-juin 1948, 178-83; Archie Roose-

velt Jr., Where Turk and Russian meet, di Manchester Guardian, 14, 16, 18, 21, 23 Cotmeh 1947 de (wergerandina fransîzî di Orient-Occident, LXXXLL/1, 133 "30 Mijdar 1947", LXXX-III/1, 141 "Kanûn 1947" de); The Assyrian National Petition, presented to the World Security Conference at San Francisco, may 7th 1945, Kimball Press, 1946; L'épine dorsale stratégique de l'Asie Mineure de connaît pas le calme, di Frankfurter Allgemeine Zeitung, 16. 6. 1956 de (wergerandina fransîzî di Orient-Occident, CCCXXII/1, 382 de "17 Tîrmeh 1956"); R. Rossow Jr., The battle of Azerbaijan, 1946; M. E. J., winter 1956; W. Douglas, Strange Land and Friendly People, London 1952; W. Eagleton Jr., The Kurdish Republic of 1946, London 1963; Th. Bois, Mahabad, une éphémère République kurde indépendante, di Orient, N° 29 (1964), 173-201 de; I. C. Vanly, Aspects de la question nationale kurde en Iran, Parîs 1959; Parviz Homa-younpour, L'affaire d'Azerbaïdjan, Lausanne 1967.

Dûmahî heye



EMIR DJELADET BEDIR KHAN  
und  
ROGER LESCOT

## Kurdische Grammatik

Kurdische Grammatik

Kurdisches Institut, Deutsche Sektion, Bonn  
Verlag für Kultur und Wissenschaft, Bonn

# KÜRTLERDE SANAT\*

- III -

Nêrgiza TORİ


## URARTULAR

Kürtler M.O. 3700'lerden başlamak üzere çeşitli tarihlerde, çeşitli adlarla devletlerini kurmuşlardır. Kürtlerin tarihi araştırıldığında görüleceği gibi bu Kürt devletleri kendilerinden bir önceki devletin yıkıntıları üzerinde devletlerini kurmuşlardır. Bu yazımızda sanatını örnekleyeceğimiz Urartular da devletlerini kendilerinden önceki Nairi (Nehri) devletinin yıkıntıları üzerinde kurmuşlardır.

Daha önceki yazılarımızda yaptığımız gibi, sanatını örneklediğim halkımın bu kesiminin önce kısaca tarihine değinecek, ilk görüldükleri yer ile kurdukları devletin coğrafi konumunu vereceğim.

Urartu'nun eski adı **Arart**'dir. Arart'ın kutsal kitap Tavrata'taki adı da Urartu'dur.

Bu nedenle Assur'lular bu yöreye Urartu demişlerdir. Oysa onlar kendilerine (Bia), ülkelerine de (Biaina) demişlerdir. Urartu devletinin merkezini Van gölünün sahilleri oluşturuyorlardı. Bu yöre Biaina adı ile adlandırılmıştı. Bu yöre halkına da, yukarıda değindiğimiz gibi (Bia) deniliyordu (\*). Urartu'lar yöre halkı tarafından Haldi (Xaldi) olarak tanınmaktadırlar. Bu ad da Urartu'ların tanrı listesinin başında yer alan büyük tanrı Haldi'den (Xaldi) gelmektedir. Günümüzde bile bu halk bu adla tanınmaktadır. Yezidi (ateşperest) olan bu halk Bohtan, Garzan, Bitlis yöresi ile Sincar (Şingal), Diyarbakir, Van ve Siirt yöresinde yerleşik, Şam ve Musul yöresinde de göçebe olarak yaşamaktadırlar (\*\*).



\* Bu yazı "Kürt'lerde Sanat"(1986 - Stockholm) adlı kitaptan özetlenmiştir.

(\*) G. A. Melikişvili, Urartu Dili (Rusça), Bilim yayınlari, Moskova 1964.

(\*\*) Şeref Han, Şerefname (Kürt tarihi), Yönetim yayınlari, İstanbul 1975.

Urartu kökenli halkın ilk görüldükleri yer Van gölünün güneyinden Bohtan bölgesine kadar uzanan yerlerde, asıl Urartular ise, Van gölünün kuzeyinden Ağrı dağına kadar uzanan bölgede yaşıyorlardı.

Biz Urartu'ları Assur yazıtlarından tanıyoruz (M.O. 1300). Bu yıllarda Urartu ve Assur'lar arasında ilk kez ilişkiler başlamıştır. Bu yılda Assur kralı Salmanassar I.dir.

Urartu'ların bilinen ilk kralı Sarduri I.dir. Bu kiral devletinin başkentini, büyük bir olasılıkla kurduğu Tuşpa (bugünkü Van şehri) şehrine getirmiştir.

Urartu devleti M.O. 8. yüzyılda kuzeyden Sevan (Gökçeğöl) gölüne, güneyden Bohtan bölgesine, batıdan Malatya'daki Fırat nehri, doğuda Urmiye gölüne kadar uzanıyordu (harita).

Sarduri I.den sonra oğlu Işpuni (825-805) on yıl süre ile kendi başına devletini yönetmiştir. Daha sonra oğlu Menuas (825-790) ile birlikte devleti yönetmişlerdir. Kiral Menuas çok sayıda yazıt bırakmıştır. Mannai'lerle olan kavgalar bu kiral zamanında kuvvetlenmiştir.

Urartu kralı Arğıştı I. (789-766) yazıtlarında Assur'lulara karşı kazandığı zaferden, oğlu Sarduri II. (765-733) de Assur kralı Assur-Nirari V.'e karşı olan yengisinden söz eder. Ne var ki Urartu kralı Sarduri II.'nin yaptığı ilerleme Assur kralı Tiglathpileser III. (745-727) tarafından durdurulmuştur. Tiglathpileser III., kiralığının sonlarına doğru Urartu'ların belli bir arazi üzerindeki hakimiyetlerine son vermiştir. Suriye'nin Akdenize kadar olan büyük bir bölümünü ülkesine katmıştır. Urartu kralı Sarduri II.'yi Van kalesindeki şatosunda kıstırmıştır. Ama burayı almayı başaramamıştır.

Urartu kralı Rusa I. Kendisine Van gölüne 5km uzakta, Toprakkale tepelerinde bir şato yaptırmış ve oraya geçmiştir. Daha sonra Urartu kralı Rusa I., Assur kralı Sargon II.'ye (721-705) karşı, Med kralı Key Kawus ve Mannai'lerle bir birlik oluşturmuşlar. Urartu'nun Rusa'sı Urmiye gölü ve kuşun bile uçmadığı Sahend dağı arasındaki dar geçitte Sargon II.'nin ordusuna karşı pusu kurarak siper almıştı. Oradaki bir yarmadan Assur'lulara, onların yorgunluktan öldükleri ve susuz oldukları bir zamanda saldırıyordu. Assur kralı küçük bir grup atıyla birleşmiş düşmana, hiç beklenmedik bir yerden saldırmıştı. Bu beklenmedik saldırısından galibiyet elde etmişti. Rusa I., ordusunun gözü önünde atını mahmuzlayarak kaçmış ve bundan hemen sonra dağlarda ölmüştür. Sargon Van gölüne

kadar olan, yolundaki bütün şehirleri yağmalamıştır. Sargon geri dönerken askerlerinden 144 kişilik bir grubu yanına almış, gerisini memleketine geri göndermiştir. Kendisi, yanındaki grupla dağ şehri Mussassir'e (Urartuların din merkezi) saldırmış. Oradan, yazıtlarında büyük detaylarla anlattığı sayılmayacak zenginlikte yağmalamalar yapmıştır. Bu saldırısında daha kuzeydeki barbar halk Kimmerler Assur ordusuna büyük yardımda bulunmuştur. Ne ki Sargon II. yazıtlarında bu konudan hiç söz etmemiştir (\*\*\*).

Urartu kralı Arğıştı II. (713-679) zamanında merkez bölge olan (Biaina)'yi egemenliği altına alarak kuzeyde Erzincan'a kadar, burada da önemli yer olan Altıntepe'ye kadar uzanmıştır. Altıntepe, Urartuların metal işlemlerinin çoğunun bulunduğu yerdir.

Urartu kralı Rusa II. (678-654) bazı Kimmerli askerleri paralı asker olarak Assurlulara karşı kullanmış ise de, Assur kralı Sargon II., oğlu Senharib (704-681) ve onun takipçisi Assurhaddon'a karşı başarılı olamamıştır.

Daha sonra da (M.O. 600) Assur devletini ortadan kaldıran Med'ler, Urartu devletini ortadan kaldırarak Urartu ülkesini kendi ülkesine katmışlar. Urartu halkı da soydaşları olan Med'ler ve Trakya'dan yeni gelen ve Ararat bölgesine Ari, fakat İran halkları grubundan olmayan Ermeni'lerin arasına katılmışlardır.



TESTİ. Yuvarlak gövdeli, geniş boğazlı ve dışa doğru çıkık ibiğe sahip bronz bir testi. Boyun ve gövde arasında belirgin bir yuvarlak çıkıntıya sahip. Yüksekliği: 23,7 cm., Doğu Türkiye, Roman-German Sentral Müzesi, M.O 8 ve 7. asır.

(\*\*\*) Universele Wereld Geschiedenis, cilt II, sayfe 90.

Urartu'lar yalnız bronz sanatında değil, mimari, ki bu sivil ve askeri mimari, dinsel mimari gibi bölümlere ayrılabilir, heykel ve resim, metal sanatı, silah ve silah gereçleri, tahta ve mobilya, çanak çömlek işleri, toprak işleri ve fildişi işlemeciliği dalında da etkinlikler yapmışlar, günümüze kadar uzanan değerli ürünler vermişlerdir. Ama biz, konunun genişliği nedeniyle, sadece Urartuların bronz sanatını örnekleyeceğiz.


Her şeyden önce Urartu'ların yaşadığı bölgeler Türkiye, İran, ve Sovyetler Birliği sınırındadır. Bu bölgelerin büyük çoğunluğu, özellikle Türkiye ve İran'da askeri bölgelere düşüyor. Biz bunun ne demek olduğunu anlıyoruz.

Karmir Blur'da yapılan kazılarda kiralara ait oldukları belli olan miğferler çıkarılmışlardır (şekil 1). Bulunan bu miğferler üstünde sürücüler, atlar ve kanatlı hayvanlar ve diğer hayvanların süslemeleri bulunmuştur. Urartu sanatında aslanlar ve boğalar genelde daha az kizgındırlar. Normalden daha uzun bacakları vardır. Bu değişiklik daha çok 8.inci asırda belli oluyor. Yedinci asırda Toprakalede bulunan eserlerde eski Assur sana-


tındaki insan ve hayvan süslemelerinin etkisi görülüyor. Ama aslanların ve boğaların uzun bacakları, kıvrımlı ve değişik şekilde duruşları Assur sanatına yabancıdır. Adilcevaz'da bulunan bir kabartmada açıkça görülüyor ki Urartu sanatının bazı tipik özelliği vardır. Örneğin, aslan ve kaplan şeklindeki çıkıntılar Urartu sanatını Assur sanatından ayırıyor. Bunlar geç Hitit döneminden ve Ermeni kiralığından ödünç almışlardır. Bu tür eserler Hurri'lerin Suriye ve Anadolu'daki sınır şehirlerinde çok kuvvetliydi. Urartu'ların sanatındaki bu özellikler, Hurri'lerden geldiği düşünülebilir. Bunlar kuzey Urartu'ya doğru Assur'lara doğru gitmek için kaçan el işçileri tarafından getirilmiştir. Urartu etkisinin izleri özellikle Frigya ve Delfhi, Korithe ve Etruriride de bulunan metal işlemlerinde görülüyor. Burada bulunan bazı yapıtlar Urartu'dan ithal edilmiş olabilir.

Yazımıza ek olarak sunduğumuz az sayıda ki örnekler Urartu sanatı hakkında yine az da olsa, bilgi vereceği kanısındayım.

SON



(Şekil 1)



# Z I M A N Ê K U R D Î

Belavbûna cografî ya zaravên wî (\*)

- IV -

Fuad Hama XORŞÎD

## D- ZARAVÊ GÛRANÎ

Zaravê gûranî (42) li navçeya ku ji Bakurê riya ku her du bajarên Qesrî Şîrîn û Kermaşahê digihîne hevdu li Başûr heta çiyayên Hawramanê li Bakur, û ji kaniyên çemê Sîrwanê li Rojavayê heta Kermaşahê li Rohilatê dirêj dibe fireh dibe. Gûranî di vî awheyayî (iklîm) de yekîtiyeke êlî ava dikin û zimaneke tenê ku navê wî kir zaravê gûranî dipeyivin. Bi vî zaravî êlên Hewraman, Rijab û Kandule - nêzîkî Kermaşahê -, şaxên rayî (eslî) yên êlên Sincabî, Gûran û Bacilan (43) û Şebekên ku li Bakurê bajarê Mûsilê, li goma çemê Xewsarê, rûdinên dipeyivin.

Ev zarav di çar şaxan de dabeş dibe:(44)

1- Gûraniya rayî (eslî)

2- Hewramanî

3- Bacilanî

4- Zazakî

Gûraniya rayî, pê rûniştevanên navçeya Kirind-Zihaw û Ciwanrû, hin Kakaiyên Tawûq û hin êlên Zenkene, nêzîkî Kifrî, dipeyivin (45).

Hewramanî zaravekî gelek narîn û balkêş e (46). Pê rûniştevanên çiyayên Hewraman, Pawe û Pilinkan û yên derdorên wan dipeyivin. Hewraman di du şaxan de tîndar dabeş kirin: Lehûn ku li Rojavaya zincîrê çiyayên

(\*) Çapxana El-Wisam, Begdad, 1983. Wergerandin, erebî-kurdî: Pervîn.

(42) Minorsky bawer dike (çavakniya buhurî, rûpel 78) ku gotina Gûran ji yek ji vana hatiye:

1- Gotina Kabral (merivên Zerdeşt) - Kewran - Kûran

Yan ji:

2- Navê êlî Kewberkan - Kewrekan Kûrkan - Kûran - Gûran

(43) 1- Soan, E.B. (Short Anthology... ), berhema buhurî, rûpel 59

2- Driver, G.R., berhema buhurî, r. 505

3- Napier, G.S.F., (The Road from Baghdad to Baku), G. J., Cild LIII, N° 1, 1919, r. 86-9

4- Felix, James, Memories by Commander James Felix, Bombay 1957, r. 156, 162-63, V. Minorsky

5- The Encyclopaedia Britannica, berhem bixwe, r. 950

(44) The Guran, berhema buhurî, r. 88

(45) Edmonds, C. J., Kurds, Turks..., berhema buhurî, r. 10

(46) Zekî, Muhammed Emîn, berhema buhurî, r. 324

Hewramanê (ango li Iraqê) rûdinên (47) û Text ku li Rojhilata vî zincîrî (ango li Iranê) rûdinên.

Bacilanî zaravekî belavbûyî ye. Em beşeke ji wan, ku li Rojhilata Mûsilê - bi navê Şebek tên nas kirin -, li Zehaw, Bakurê Lûrîstanê, nêzîkî Xaneqînê (48) û li Qûretû, Hûrîn û Şêxan (nahiya Meydanê) li Iraqê rûdinên, dibînin. Li gel belavbûna navçeyên vî zaravî, zaravê ku pê Bacilanî dipeyivin di hemî navçeyên wan de nêzîkî hev e. Lê ji sedema tevlihevbûna Bacilanî û Kurmanciya navîn, kartêkirinên (tesîr) zimanî yê vekirî yê vî zaravê dawîn li ser wî çêbûn (49).

Zazakî yek ji zaravên gûranî yê şaxî tê hesab kirin. Lê tiştê ecêb di vî zaravî de cihê wî ye. Ji bo ku ew ne di nav awhewayê zaravê gûranî de ye, lê li navçeyeke ku jê, ber bi Bakur, gelek dûr e. Meriv dikare cihê wî li navçeya ku di navbera Erzurûm-Mûş-Xarpût-Erzincanê de ye dest nîşan (tesbît) bike. Û bi awakî vekirîtir, ew li navçeya ku di navbera her du rûbarên Murad Su û Firat Su heta rawesta (nuqte) rasthatina wan li Başûrê çiyayê Muşîr Dag de ye, ango di nav navçeya Dersîmê de, cih digire (50).

Zaravê gûranî, weka ku Soan û Driver nîşan da, zaravekî ne jîndar e (50). Dibe ku sedema ku ew anîn vê baweriyê kêmbûna kesên ku bi vî zaravî - eger em wî bi zaravên din ên kurdî bipîvin - dipeyivin, û kêmbûna nivîsaran li ser vî zaravî ye. Ango, ji sedema xizaniya wî ji aliyê pêma-hiya (mîras) bêjeyî (edebî). Heyama (dem) zêrîn a yekta (bitenê) ku ev zarav jiya geşbûna ku di bin destê mîrên Erdelanê de dît bû (52). Wan di sarayên xwe de helbestvan û bêjevanên (edîb) ku bi vî zaravî dinivîsîn gelek han didan (teşwîq dikirin).

Lê ev zarav di dema ketina vê mîriya kurdî de, di bin destê Kacaran de, di sala 1867 de, gelek paş ve çû (54). Mîrên Babanî yê pêşîn jî helbestvanên vî zaravî han dan (55).



(47) Di jimartina (statîstîk) sala 1957 de hat dîtin ku 5000 kes ji Hewramanê di 28 gundan de, li qezayê Helbejê, li Iraqê, rûdinên. Ji van gundan: Tewîle, Biyare, Xirpanî, Ezbirûn. Li Wezareta Hundirî, rehberê jimartinê yê sala 1965, r. 366 binêre.

(48) Di jimartina 1957 de hat nivîsîn ku 257 kes ji Balicanê li navçeyên Bablawî û Elyawe, li Xaneqînê, rûdinên. Li Wezareta Hundirî, çavkaniya buhurî, r. 396 binêre.

(49) Driver, G.R., berhema buhurî, r. 505

(50) 1- Minorsky, V., berhema buhurî, r. 76  
2- Driver, G.R., berhema buhurî, r. 506

(51) 1- Soan, E.B., berhema buhurî, r. 57  
2- Driver, G.R., berhema buhurî, r. 505

(52) Li pirtûka Zekî, Muhammed Emîn (Dîroka Dewlet û Mîriyên Kurdî), wergerandina erebî ya Muhammed Elî Ewnî, Qahire, çapxana Seade, 1948, û li Kurteya Dîroka Kurd û Kurdistanê, berhema buhurî, r. 331 binêre.

(53) Edmonds, C. J., berhema buhurî, r. 10

(54) Soan, E.B., berhema buhurî, r. 53

(55) Edmonds, C. J., berhema buhurî, r. 10

Ji hemî tiştên ku hatin dîtin xuya dibe ku zimanê kurdî yek ji zimanên hindî-ewrupî yên serbixwe ye, û ku ew di dirêjayiya sedsalan de bi paraztina hemî taybetiyên (xusûsiyet) xwe yên zimanî yên resen (esl) pêş ve çû, li gel kartêkirina wî li her navçeyan bi zimanên hawsê (cîran), ji sedemên bazarî (aborî) yan olî (dînî).

Ziman - her ziman - perçeke ku nayê perçe kirin ji şareyariya (medeniyet) netewekî ye. Û ziman, weka şareyarî, ji guhertin û pêşveçûnê re vekirî ye, ji sedema serhevbûna (kombûn) mezin a tecrubên gelê ku ew çêkiriye. Dibe ku gelek ji gelên din di awayên zimanî ku ew bi kar tînin (istimal dikin) de bi awakî vekirî cihê be, lê ew zarokên netewekî tenê tên hesab kirin eger ew bawer bikin ku ew zimanekî tenê dipeyivin. Û ev, bi taybetî, yekbûna hest (hiss), dîrok, adet û rewîştan (exlaq) pêwîst dike. Yek ji rengdêrên (sifet) bîngehî yên zimanekî jîndar pêşveçûn û guhertin e. Ew di dirêjayiya zemanên cihê de diguhere û rengdêrên wî yên hûr ji aliyê cografî, ango ji navçeyekê bo navçeyeke din, cihê dibin. Ango, ew pêş ve diçe.

Pirsa giring ku xwe li vê derê datîne ev e: Rêjeya (nisbet) cihêtiya biizîna di nav zimanekî tenê de çiqas e, û kînga cihêtiya di navbera zaravan de dibe sedema çêkirina zimanên cihê û veqetayî?

Bersiva vê pirsê di destnîşandana me ya têgihajtina netew de dimîne. Em li ser her du regezên (unsur) bawerî û hest rawestiyên, ango dema ku kesên ku bi zaravên cihê dipeyivin rêjeya cihêtiya ku di nav van zaravan de heye ne giring e (56).

Bi vî awayî, em dibînin ku pileya (derece) cihêtiyê di nav zaravên zimanê kurdî de çiqas be jî, ev yek ne mimkin e ku weka bîngeh bê stendin ji bo têkdana (xerakirin) reseniya vî zimanî, yan ji bo veqetandina hin zaravên wî ji rayên wan ên kurdî. Dema ku kesên ku bi vî zimanî dipeyivin ew bixwe dilniya (tekîd) dikin ku ew bitenê bi zimanê kurdî dipeyivin, bi ser de jî dema ku ew ji aliyê rewîşt û hest xwe bi hevdu girêdayî dibînin, ev têrê dike ji bo daxistina hemî dîtinên ku li ser zimanê kurdî û zaravên wî hatin gotin û ku mebesta (meqsed) wan têkdana xweyiya (şexsiyet) vî zimanî û inkarkirina reseniya wî ya zimanî ye.

Ç A V K A N Î

A- ÇAVKANİYÊN EREBÎ

- ١ - انور المائى (الاکرد فى بهدینان)، الموصل، ١٩٦٠
- ٢ - جیمس هنرى براستد (تاریخ العصور القدیمة)، ترجمة داود باقر، بیروت و ١٩٢٦
- ٣ - خلیل ابراهیم حماش (اللغة والحضارة)، مجلة الاقلام، العدد ٦، السنة العاشرة، اذار، ١٩٧٥.
- ٤ - شرفخان البدیسى (شرفنامه) ترجمة محمد علی عونى، ح ١، القاهرة، ١٩٥٨
- ٥ - شرفخان البدیسى (شرفنامه) ترجمة ملا جمیل بندى روزبیانى، بغداد، مطبعة النجاح، ١٩٥٣
- ٦ - محمد امین زکى (تاریخ الدول والامارات الكردية) تعریب محمد علی عونى، مطبعة السعادة، القاهرة، ١٩٤٨.
- ٧ - (خلاصة تاریخ الكرد وکردستان) ترجمة محمد علی عونى، ط ٢، ج ١، بغداد، ١٩٦١.
- ٨ - وزارة الداخلية (دلیل التعداد العام للسنة ١٩٦٥) بغداد، ١٩٦٥

(56) Hemmaş, Dr Xelîl İbrahîm (Ziman û Şareyarî), kovara Eqlam, hejmar 6, sal 10, Adar 1975, r. 48-49



- ٩ - شرفخانی بدلیسی (شرفنامه) ده‌گۆڤاری هه‌زار، چاپخانه‌ی نعمان، بغداد، ١٩٧٢.
- ١٠ - عزالدین مصطفی رسول (زمانی نه‌ده‌بی‌یه‌ کۆرتووی کوردی) بغداد، ١٩٧١
- ١١ - کمال فؤاد (زاراوه‌ کانی زمانی کوردی و زمانی نه‌ده‌بی‌ و نووسینیان) گۆفاری زانیاری، ژماره ٤، ١٩٧١
- ١٢ - محمد خال (فه‌ ره‌ه‌ نگی خال)، سلیمانی، ١٩٦٠

C- ÇAVKANIYÊN INGİLİZİ

42. Major Rawlinson, (Notes on amarch from Zahab, at the foot of Zagros, along the mountains to Khuzistan (Susiana), and from thence through the province of Luristan to Kirmanshah, in the year 1836), J.R.G.S., Vol. 9, part 1, 1839.
43. Sir Arnold T. Wilson, (The Bakhtiaries), J.C.A.S., 1926, Vol.XIII, part 111.
44. T. Cyler yong, (The Iranian Migration into Zagros), IRAN., Vol.V, 1967.
45. V. Minorsky, (The Guran), B.S.O.A.S., 1934, Vol.XI, part 1.

26. Williams Moris, (The Heritage illustrated dictionary of the English Language) New York, 1973.

C. Reports:

27. Arnold Talbet Wilson, (Military report an S.W. Persia-Luristan), Vol.5. Simla, 1912.
28. E.B. Soan, (Report on the Sulaimani District of Kurdistan), Calcutta, 1918.
29. E.M. Noel, (Diary of Major E.M. Noel on Special duty in Kurdistan from June, 4th to september 21st, 1919, Basrah, 1919.
30. Military report on S.W. persia, (Kuhgalu Country), Vol.IV, Simla, 1919.

D. Articles and Journals:

31. Basile Nikitine, (Kurdish stories from my collection), B.S.O.S., Vol.IV, 1926-28.
32. C.J. Edmonds, (The place of the Kurds in the Middle Eastern Scene), R.C.A.J., 1958 Vol.XIV, Part 11.
33. Colonel H.A. Sawyer, (The Bakhtiari Mountains and upper Elam), G.J., Vol.IV, No.6 1894.
34. De Bode, (The country of Mamasani and Kuhgilu), J.R.G.S., Vol.13, part 1, 1843.
35. E.B. Soan, (Notes on the phonology of Southern Kurdish), J.R.A.S., 1922, part 11.
36. E.B. Soan, (Short anthology of Guran poetry), J.R.A.S., 1921, part 1.
37. Edward Noel, (The character of the Kurds as illustrated by their proverbs and popular saying), B.S.O.S., 1920. Vol.1, part IV.
38. G.R.Driver, (Studies in Kurdish history), B.S.O.S., 1922, Vol.11, part 111.
39. G.S.F. Napier, (The Road from Baghdad to Baku), G.J., Vol. L111, No.1, 1919.
40. Jarl Charpentier, (The original Home of Indo-Europeans), B.S.O.S., Vol.IV, 1926-28.
41. J.V. Harrison, (The Bakhtiari Country), G.J., Vol.LXXX, No.3, 1932.

ح- المصادر الانكليزية

A. Abbreviations:

- G.J. = Geographical Journal  
J.R.G.S. = Journal of the Royal Geographical Society  
B.S.O.S. = Bulletin of the School of Oriental studies  
B.S.O.A.S. = Bulletin of the School of oriental and African studies.  
J.R.A.S. = Journal of the Royal Asian Society  
R.C.A.J = Royal central Asian Society Journal

١ - المصطلحات:

B. References:

13. Austen H. Layard. (Discoveries among the ruins of Nineveh and Babylon, with travels in Armenia, Kurdistan and Desert) New York, 1853.
14. C.J. Edmonds. (Kurds, Turks and Arabes), London, 1957.
15. E.B. Soan, (Grammar of the Kurdish Language), London, 1913.
16. George N. Curzon, (persia and persian question) London, Vol.2, 1892.
17. Henry field, (Contribution to Anthropology of Iran), Chicago, 1939.
18. James Creagh. (Armenians, Kourds and Turks), London, 1880.
19. M.M. Van Bruinessen. (Agha, Shaikh and state, 1968.
20. Mrs. Bishop, (Journy in persia and Kurdistan) Vol.1, London, 1981.
21. Raphael Patai, (Society, Culture and change in the Middle East), 3rd Edition, 1971).
22. Taufiq Wahby and C.J. Edmonds, (A Kurdish-English dictionary), Oxford, 1966.
23. The Encyclopaedia of Islam, Vol.1, Leiden, 1960.
24. Vantan Melkonian, (The Grass-folk: Notes on Bakhtiaries), The Faiha press, Basrah, 1940.
25. William O. Douglas, (Strange Land and friendly People), London, 1951.

٢ - الكتب والمراجع:

# XEBATA ME

## 25 MIJDAR 86

Civînek bi rêxistinên belçikî û biyanî re ji bo amadekirina bernama pratîk a her sê rojên seminera ku ewê di 3, 4 û 5 Nîsan 87 de li ser mafê penaberiyê (iltica) li hemî Ewropa, li Palais des Congrès, li Bruxelles bê pêk anîn. Gelek rêxistin ji hemî welatên Ewropa xwe qeyd kirine vê seminerê.

## 26 MIJDAR

Seminerek li Zanîngeha Louvain-La-Neuve li ser fêrkirina Islamê ji zarokên biyanî re, di dibistanên belçikî de, ji aliyê du civakzanên (sosyolog) pêşverû ku di beşa lêgerînê "Peuples et Migrations" de dixebitin hat amade kirin. 130 kes: Mamos-te, mufettiş, berpirsiyarên wezaretan, nûnerên rêxistinan..... beşdarî seminerê bû bûn. Piştî axaftina civakzanekî tirk, endamek ji Têkoşer pê re, li ber hemî beşdaran, gotûbêjeke (munaqeşe) dirêj û xurt li ser mafê Kurdan li Tirkiyê kir. vî civakzanî çiqas "pêşverû" be jî, ne dixwest ku bi awakî vekirî bipejirîne "qebûl bike" ku çanda Kurdan ji ya Tirkan cihê ye û ku zimanê wan li Tirkiyê qedexe ye.

## 10 KANON

Di çarçeva xebata dirêj li ser Mafên Mirov û Gelan de, koordinasyoneke bi navê "Şebeka Agahdarî û Fêrkirina Mafên Mirov û Gelan"

û ku 44 rêxistin imza kir ava bû. Mêdyatêka Wezaretê Çandê ya belçikî civîneke çapê li Passage 44 pêk anî, ji bo pêşkeşkirina katalogeke nuh ya pirtûk, film, sîlik.... ên li ser mafên mirov û gelan. Têkoşer tê de navên pirtûk, film û sîlikên kurdî weşandin

## 25 SEBAT 87

Şebeka Agahdarî û Fêrkirina Mafên Mirov û Gelan civîneke çapê li Parlamana Ewropa, li Bruxelles pêk anî. Di vê civînê de, Têkoşer li ser rewş û mafê gelê kurd peyivî (li rûpel binêre). Parlamentêra belçikî, Raymonde Dury, îlan kir ku parlamentêr divên ku piştgiriya rêxistinên kurdî bikin û hikûmeta Tirkiyê mahkûm bikin. Nêzîkî 40 rojnamevan û berpirsiyarên rêxistinan beşdar bû bûn. Têkoşer û komelên din di salonê de pirtûk û broşurên xwe raxistin. Li rûpel 4 binêre

## 4 A D A R

Vekirina cihê nuh ê Têkoşer. Gelek kes, ji cinsiyetên cihê hatin pîroziya me û me bi hev re şeveke xweş û geş derbas kir.

## DI MEHÊ DE CAREKÊ

- Civînen Şebeka Mafên Mirov û Gelan.
- Civînen mafê helbijartinên şaredariyî ji bo biyaniyan.
- Civîn bi komelên civakî yê şaredariya St-Josse re.

# N Û Ç E

## BELÇÛKA

Îsal, li Zanîngeha Katolîk a Leuven, beşa Oryantalîzm, Fêra Kurdî vebû. Hevalekî Kurd vê fêrê dide.

## DANIMARKA

Radyoya kurdî dest pê kir. Her Yekşem, seet

18.30-19.30, weşan çêdibe. Hûn dikarin nûçe, kasetên muzîkê û hwd. ji navnîşana vê radyoyê re bişînin:

Hozan S. Kiliçaslan

Kongsdalvej 51

2720 Vanlose

DANMARK

# TÊKOŞER'DEN HABERLER

## 25 KASIM '86

Brüksel'de Palais Des Congrès'de 3,4 ve 5 Nisan'da olacak tüm Avrupa'daki mültecilerin hakları konulu seminer için pratik bir programın hazırlanması için çeşitli Belçika'lı ve yabancı örgütler ile toplantı. Avrupa'nın çeşitli yerlerinden örgütler bu seminere katılmak için kayıt yapmışlardır.

## 26 KASIM

Göçmenlerin çocuklarına İslam'ı öğretmek konulu Louvain-La-Neuve Üniversitesindeki seminer. Bu seminer "Peuples et Migration" araştırma kısmında çalışan ilerici iki sosyolog tarafından hazırlanmıştı. Öğretmen, müfettiş, elçilik temsilcileri, örgüt temsilcileri...'nden oluşan 130 kişi bu seminere katıldı. Türk bir sosyologun konuşmasından sonra Tekoşer'in bir temsilcisi Türkiye'de Kürtlerin durumu hakkında bir konuşma yaptı ve bu konu uzun uzun tartışıldı. Seminerde konuşma yapan Türk sosyologu her ne kadar "ilerici" idiyse de Türkiye'de Kürt halkının kültürünün Türk kültüründen ayrı olduğunu ve Kürt dilinin resmen yasak olduğunu açık bir şekilde kabul edemiyordu.

## 10 ARALIK

İnsan ve Halkların Hakları konulu uzun çalışmaların çerçevesinde "İnsan ve Halkların Haklarını öğretme ve İnfomasyon" adında bir koordinasyon gurubu oluşturuldu. 44 örgüt bu koordinasyon gurubunda çalışmak için imza atmıştır. Belçika Kültür Bakanlığına bağlı Mediyatek Passage 44 te bir basın

toplantısı yaparak insan ve halkların hakları konulu bir kitap, film ve plak katalogu sergisini basın mensuplarına sundu. Têkoşer bu kataloga Kürtler ve Kürdistan sorunu hakkındaki kitap, film ve plakların listesini kaydettirdi.

## 25 ŞUBAT '87

"İnsan ve Halkların Hakları Öğretme ve İnfomasyon" koordinasyon gurubu Brüksel'de Avrupa Parlementosunda bir basın toplantısı yaptı. Bu toplantıda Têkoşer Kürt halkının durumu ve hakları hakkında konuştu. Belçika'lı parlementer Raymonde Dury, konuşmasında parlementerlerin Kürt örgütlerini desteklemelerini ve Türkiye devletini mahkûm etmelerini istedi. 40a yakın gazeteci ve örgüt temsilcileri bu toplantıya katıldılar. Têkoşer ve çeşitli örgütlerin infomasyon sergileri toplantı boyunca salonda kuruluydu. (sayfa 4 bakınız)

## 4 MART

Têkoşer'in yeni yerinin açılışı. Çeşitli milliyetlerden insanlar Têkoşer'in yeni evinin açılışına katılıp iyiniyetlerini göstererek Têkoşer'in çalışmalarını kutladılar. Açılış gecesi hoş ve neşeli bir hava içinde geçti.

## AYDA BİR

-İnsan ve Halkların Hakları Gurubu'nun toplantıları.  
-Göçmenlerin belediye seçimlerinde seçme ve seçilme hakları toplantıları.  
-St- Josse belediyesi sosyo-kültürel örgütleri ile toplantılar.

## H A B E R

### Belçika:

Bu öğretim yıldönümünde Leuven Katolik Üniversitesinin Doğu Bilimleri fakültesinde, Kürtçe dil dersi bir Kürt arkadaş tarafından verilmektedir.

### Danimarka:

Kürtçe Radyosu yayın hayatına başladı. Her

pazar günü saat 18.30-19.30 arası olan radyo yayınının aşağıdaki adresine haber, müzik kasetleri ve benzeri şeyleri yollayabilirsiniz.

Hozan S. Kiliçaslan  
Kongsdalvej 51  
2720 Vanlose  
DANMARK

# NEWROZ

NOUVEL AN KURDE

SAMEDI  
ZATERDAG

KOERDISCH NIEUWJAAR

★ *CHANTS* et *DANSES* KURDES

28-3-1987 — 15 h./u.

★ *EVİN* et *GROUPE*  
★ *GROUPE BABYLONE*  
★ *MIMES*  
★ *STANDS*  
★ *BUFFET*

★ KOERDISCHE LIEDEREN en DANSEN  
★ EVİN en GROEP  
★ BABYLONE GROEP  
★ PANTOMIMEN  
★ STANDEN  
★ BUFFET



**V.U.B. AUDITORIUM Q.A., PLEINLAAN 2 — 1050 BRUSSEL — XL.**

(METRO PETILLON, TRAM 90, BUS 95, 96, 23)

PREVENTE  
VOORVERKOOP : 100 Fr.

ENTREE  
INGANG : 150 Fr.

ADRESSE DE CONTACT  
KONTAKTADRES : TÊKOŞER — Tél. 230.89.30

ORGANISATEUR  
ORGANIZATOR : **TÊKOŞER**

AVEC LA COLLABORATION DE STUDIEKRING VRIJ ONDERZOEK (V.U.B.)  
MET MEDEWERKING VAN  
ED. RESP.  
V.U. : W. De Villeghere — Longinstraat 12 — 1730 ASSE